

**Ê** dî bi awayekî zelal û diyar tê dîtin ku qedera her du parçeyên welêt bûye yek. Ev jî mêj ve jî hêla PKK'ê ve dihat gotin, lê îro êdî YNK jî dibîne ku heta li Bakur kêşeya kurd çareser nebe, dewleta tirk nahêle ku li Başûr kurd tiştêkî bi dest bixin. Her wiha êdî dewleta tirk jî bi kurdên başûrî re şer dike. Lewre hem niha bi hezaran kurdên başûrî di nav refên ARGK'ê de cih girtine, hem jî rêxistinên kurd li hemberî artêşa tirk hevkarîyê bi PKK'ê re dikin.

Rûpel-3

## Qedera Başûr û Bakur dibe yek

Nûçe-Şirove:

**Bûyera Susurlukê jî  
lîstikeke gladiyo ye**

Rûpel 8-9

Osman Özçelik:

**Jiyanek bi êş û elem:  
Celadet Alî Bedirxan**


Rûpel 4-5

Bîrewerî:

**Fermandar Delîl,  
Şehîd Orhan Tekiner**

Rûpel-6





SAMI TAN

Pratîka hevala Gurbetelli mînaeke baş e. Miroveke ku li gorî pîvanên civaka birjuwa xwe "rizgar" kiriye, li welatê xwe vedigere û diçe li parçeyekî welêt şehîd dikeve. Ev pratîk kurdan dike netewe û mirov.

## Netewebûn û pratîka Gurbetelli Ersöz

**N**etewebûn bi sazibûnê pêk tê. Neteweya bê sazî û rêxistin ji hevketî û bela wela ye. Gelê kurd ev rastî piştî pengava 15 gelawêjê dît.

Piştî vê yekê jî saziyên neteweyî li pey hev, li hundir û li derve derketin holê. Gava yekemîn di warê çapemeniyê de hatin avêtin. Pêşî Yenî Ülke, piştî re Welat û Özgür Gündem û yên din. Di vê rê de gelek şehîd hatin dayîn, hinek ji wan bi destê kontrayan li kuçe û kolanên bajarên welêt hatin kuştin. Hînekan ji wan jî terciheke din kirin, ketin nav refên gerîla. Hevala Gurbetelli Ersöz yek ji wan kesan bû, heftiya çûyî ket nav refên pakrewanên welatê xwe.

Bi awayekî surîştî, şehîdketina wê li nav raya giştî ya kurd gelekî deng veda û saziyên kurd rêz û hurmeta xwe ji bîranîna wê re diyar kirin. Hinek kesên mîna Emin Çölaşan dîsa dest bi karê xwe yê kirêt kirin û xwestin bi vê yekê saziyên kurd bikin hedefa êrîşên dewletê. Li aliyekî kesên wisa dixwazin çavê me bitirsînin. Ji wan kirî ku emê li hemberî wê

yekê helwesta xwe nerm bikin û xwedî li şehîdên xwe demevin. Lê wisa xuya ye ku van kesan ji pratîka çapemeniya kurd a bi salan tiştek fêhm nekirine. Kesên ku di çapemeniya kurd de xebatê dikin, xwediyê hinek bîr û baweriyên in, hê di destpêkê de dizanin ku bedela ramanên bi vî rengî çi ye, amade ne ku li her cihî berevaniya bîr û ramanên xwe bikin û heke pêwîst be bedelê wê yekê jî bidin.

Helwesta kesên wekî Çölaşan deynin aliyekî, ew ji bo me zêde ne girîng e. Tiştê ji bo me girîng helwest û pratîka heval Gurbet e. Di vê pratîkê de netewebûna kurdan weşarî ye. Tê dîtin ku tevgera azadiyê, kurdan dike netewe; kurdan dike mirov. Berê civaka kurd belawela bû. Cudatiyên olî, çandî û eşîrî dibûn sedemê şer û pevçûnan. Kurdên kurmançê dimil, kurdên soran ên kurmanç nas nedikirin. Her eşîrêk bi serê xwe xuya dikir, lê pîrî caran dibûn pêlîstikên dijîmin, ji bo tiştekî biçûk xwîna hev dirijandin.

Îro rewş bi temamî guheriye, cudatiyê ku me li jor qala wan kir, êdî nabin sede-

ma şer û pevçûnan, wekî dewlemendiya civaka kurd tînin dîtin. Di televîzyona kurdî de bi sê zaravayan weşan tê kirin, kurdên êzîdî, alewî û sûnî bi hev re kêşeyên neteweyî nîqaş dikin, ji bo doza neteweyî mil dane hev kar û xebatê dikin.

Her wekî me li jor jî diyar kir, pratîka hevala Gurbetelli di vî warî de mînaeke baş e. Heval Gurbet ji Paloyê ye, yanê kurdeke dimil e, li Zanîngeha Çukurovayê bûye mamoste, lê paşê dev jê berdaye bûye Gerîndeya Weşanê ya Özgür Gündemê û piştî jî çûye li çiyayê başûrê Kurdistanê Şehîd ketiye. Yanî miroveke xwendê, ku li gorî pîvanên civaka birjuwa xwe "rizgar" kiriye, li welatê xwe vedigere û diçe li parçeyekî welêt şehîd dikeve. Ev pratîk kurdan dike netewe û mirov.

Divê bê gotin ku kesên bi vî rengî di nav refê gerîla de gelek in. Kî dikare rêz û hurmetê ji xwedî û afirînerê wê pratîkê re negire? Kîjan lêkolîner û rewşenbîr bêyî dîtina wê rastiyê dikare lêkolîneke zanistî bike?

## Heval Gurbetelli Ersöz

*"Jiyan gulek e, bêhn bike û bide hevalê xwe"*

*Belê her wekî pêşiyên me gotine jiyan gulek e, divê mirov tertişî bijî. Mirov bêhna wê bikişîne nava dil û hinavê xwe. Lê dema pêwîst kir divê mirov xwe di ber de bide kuştin.*

*Heval **GURBETELLÎ ERSÖZ**, heta mirov bêje bes, jiyanêke tertişî derbas kir. Rûmet da jiyanê. Doza jiyanêke azad kir, canê xwe di ber vê dozê de da.*

*Heta mirovahî hebe, şehîdên doza azadiyê ji bîr nabin. Wê her bijî!*



**Xebatkarên Azadiya Welat**

## Ferhengok

<b>asayî:</b> normal	<b>kerfîkirin:</b> dilimlemek
<b>avîje:</b> pak, paqij	<b>kevnargeh:</b> mûze
<b>bafon:</b> alûmînyum	<b>mêjû:</b> dîrok, tarîx
<b>balyozxane:</b> qonsoloxane	<b>mindal:</b> zarok, gede
<b>baq:</b> qeyd, deste	<b>moşek:</b> fûze
<b>başok:</b> şahîn	<b>mûçe:</b> parinc, meaş
<b>bêgavî:</b> mecbûriyet	<b>neqane:</b> bijarte (seçkin)
<b>bêlayenî:</b> alînegir, bêteref	<b>noker:</b> caş, xulam
<b>berg:</b> kapak	<b>palpiştî:</b> piştevanî
<b>berbiçav:</b> somut	<b>paxav:</b> xem, metirsî
<b>cangorî:</b> şehîd	<b>pengav:</b> avzêl, çirav
<b>Cebilxane:</b> Cephane	<b>pispor:</b> şareza (uzman)
<b>çandînî:</b> zîraî	<b>pişe:</b> meslek
<b>çarbûn:</b> pêkhatin(oluşmak)	<b>rêl:</b> daristan
<b>çilo:</b> çawa, çito	<b>rêwî:</b> semişîşîn(yolcu)
<b>dahatî:</b> hatinî (gelir)	<b>salveger:</b> salroj (yıldönümü)
<b>daxwazname:</b> îstîda (dilekçe)	<b>sayî:</b> zelal, vekirî
<b>dehker:</b> kakil (öz)	<b>silq:</b> dîv(pançar)
<b>dêrandîn:</b> harmanlamak	<b>sirûd:</b> marş
<b>dilîn:</b> hest, hîs	<b>şayes:</b> taswîr
<b>diyarî:</b> xelat	<b>şêwaz:</b> uslup, stîl
<b>dîde:</b> çav, çim	<b>temirandin:</b> vemirandin
<b>êl:</b> eşîr	<b>teşe:</b> awa, şêwe
<b>fêrbûn:</b> hînbûn, elimîn	<b>tivir:</b> turp
<b>herikbar:</b> rawan, şayik	<b>xelûz:</b> komir
<b>hişaza:</b> serbest, azad	<b>xor:</b> roj
<b>ji mêj ve:</b> ji berê de	<b>xurîfî:</b> fêrfût (bunak)
<b>kade:</b> borek	<b>yekta:</b> bêhempa (eşşiz)
<b>kambax:</b> berbad, xerab	<b>zagon:</b> qanûn, yasa
<b>karsaz:</b> îşadami	<b>zanistî:</b> ilmî
	<b>zanyar:</b> ilimdar
	<b>zêmar:</b> ağıt
	<b>zir:</b> tiştê ne rast



# Qedera Başûr û Bakur dibe yek

Êdî bi awayekî zelal û diyar tê dîtin ku qedera her du parçeyên welêt bûye yek. Ev ji mêt ve ji hêla PKK'ê ve dihat gotin, lê îro êdî YNK jî dibîne ku heta li Bakur kêşeya kurd çareser nebe, dewleta tirk nahêle ku li Başûr kurd tiştêkî bi dest bixin. Her wiha êdî dewleta tirk jî bi kurdên başûrî re şer dike.

Serê ku li başûrê Kurdistanê didome qedera başûr û bakurê Kurdistanê zêdetir bi hev ve girê dide. Li gorî nirxandina kesên pispor êdî bêtir çareseriyê kêşeya kurd li Bakur, li başûrê welêt jî tu kêşeya çareser nabin. Heman kes didin zanîn ku dewleta tirk heta ber qirikê ketiya nava avzêla Başûr, wisa bi hêsanî nikare ji navê derkeve. Bo nimûne li gorî nûçeyê ku roja 16'ê kewçêrê di rojnameya Şerq-el Ewsat de derketiye, tê gotin ku artêşa tirk amadekariya vekişîna ji Başûr kiriye lê, ji ber ku êrişên YNK û PKK li ser PDK'ê gur bûne, ji vê biryara xwe vegeyriyaye, qismek ji hêzên xwe ji bo palpiştiya PDK'ê li herêmê hiştiye.

Dîsa hinek rojnamegerên tirk jî di gotarên xwe de bal kişandin ser rewşa ku Tirkiye li Başûr ketiye nav û ji rayedarên tirk xwestin ku hay ji rewşê hebin. Di wî warî de Sernivîskarê Turkish Daily Newsê İlnur Çevik di quncikê xwe de nirxandinek kir û bi bîra rayedarên tirk xist ku kesên ketine navbera hêzên kurdîm bi zîzar derketine. Her wiha Çevik ji rayedarên tirk dixwaze ku ew li hemberî YNK û PDK'ê bêlasyoniya xwe biparêzin.

Lê digel vê yekê jî rayedarên tirk li ser daxwaza generalên tirk derketin gera li ser welatên Ewropayî da ku propagandaya şer û pêwistiya pêkanîna kembera ewlehiyê li ser sînorê Başûr, bikin. Serokê DSP'ê Ecevit niha li ser welatên Skandinawî digere, lê diçe ku derê, jê tê xwestin ku hikûmeta tirk kêşeya kurd çareser bike û dawî li binpêkirina mafên mirovan bîne. Bo nimûne Ecevit li Norwecê ramanên fermî li ser kêşeya kurd û mafên mirovan pêşkêş kirin. Lê bi gotinên wî dilê kesî rihet nebû. Dîsa, Serokê Komîteya Nivîskarên Girtî, Endamê PEN'a Swêdê Eugene Schougin dide zanîn ku gera Ecevit a li Swêdê jî serkeftî derbas nebûye.

Her wiha tê zanîn ku balafirên tirk êrişî ser çeperên YNK'ê kirine û di van êrişan de bombeyên napalm û mîsket bi kar anîne. Piştî vê êrişê rayedarên YNK'ê helwesta xwe li hemberî dagirkeran zelal kir. Rayedarên YNK'ê jî herêmê vekişîna hêzên tirk jî xwestin û ji

civînen Enqereyê nûnerên xwe vekişandin. Wekî xaleke nû û balkêş jî, YNK di daxuyaniyên xwe de ji dewleta tirk dixwaze ku kêşeya kurd li Bakur jî çareser bibe. Dîsa Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan demekê berê di bernameya Panel a MED-TV'yê de daxuyandibû ku divê dewleta tirk li Başûr jî heta bi PKK'ê re li hev rûne. Li gorî daxuyandina Öcalan şer bi giranî di navbera hêzên Yekîtiya Neteweyî yê Kurdistanê ku serkêşiya wan ARGK dike û artêşa tirk de diqewime.

## Ji hêzên dagirker û noker 781 kuştî

Li ser xesara ku gihîştîye aliyên şer agahiyên cur bi cur hene. Tiştê ku di vî navberê zêdetir balê dikişîne ew e ku PDK ji her alî ve ketiye bin bandora dewleta tirk. Êdî ew jî wekî rayedarên dewleta tirk, di daxuyaniyên xwe de ji gerilayan re dibêjin "terorîst", her diçe zêdetir dikevin rewşa cerdevanan. Her wiha Büroya Çapemeniyê ya ARGK'ê jî li ser bilançoya şer a meha kewçêrê daxuyaniyek weşand. Ji vî daxuyaniyê tê fêhmkirin ku di vî mehê de li bakur û başûrê Kurdistanê şerekî gur qewimiye. Lewre tê dîtin ku xesareke mezin gihîştîye her du aliyên jî.

Di daxuyaniyê de pêşîn cangoriyên hêzên welatparêz hatine dayîn. Tê diyarkirin ku di meha navborî de 152 gerila û 21 pêşmergeyên YNK can dane. Di hezman katê de ji hêzên dewletê 246 leşker, 17 polis û ajan, 8 subay, 98 cerdevan hatine kuştin. Li gorî daxuyaniyê di nava mehekê de 412 PDK'yî hatine kuştin. Tê



gotin ku di vî mehê 291 çalakiyên gerila pêk hatine. Dîsa hatiye ragihandin ku 25 cerdevan dil hatine girtin û 20 heban jî xwe spartine hêzên ARGK'ê. Her wiha jî gerila dest danîne ser gelek cebilxaneyên hêzên dagirker û noker.

Li aliyê din çalakiyên ji bo lihevanîna PDK û YNK'ê jî didomin. Ji aliyekî ve Emerîka û Tirkiye pî didin ser YNK'ê ku ji herêmên ku bi dest xistine vekişe û beşdarî civînen Enqereyê bibe. Li aliyê din hêzên kurd jî bo aştîyê domdar xebatê dikin. Wekî mînak Konseya Neteweyî ji bo aştî û lihevhatinê li Kurdistanê di hejmarê 17'an a rojnameya Hetaw de projeyek ji bo aştîyê pêşkêş kiriye. Ev konseya navborî jî hêla 43 rewşenbîrên kurd ve li dervêyî welêt hatiye avakirin.

Di projeya Konseyê de tê xwestin ku her du hêzên başûrî dev ji şer berdin, ji bo ku ew şansê heyî ji dest kurdên Başûr neçe, bingeha dewleteke federalî deynin. Li gorî projeya Konseyê heta ku hîlbijartineke demokratîk pêk were, divê hikûmeteke serbixwe ava bibe; ji sedî 50'yê vî hikûmetê jî nûnerên rêxistinên kurd, ji sedî 50'yê din jî kesên teknokrat bin. Konseyê dide zanîn ku heke rêxistinên Başûr guh nedin banga wan, ewê projeyê pêşkêşî gel bikin û bi çalakiyên girseyî zorê bidin rêxistinên ku werin rayê.

NAVENDA NÛÇEYAN

## Kurtenûçe

### Bordumanî Balîsyan

Lem duwaye da çend rojêk le ser yek firokaniya Turkiya bi pistîwanî mîlîşiyay Barzanî nawçey Nefrîn le başûrî Kurdistanê debezênî Herîşekaniya êsta bowe hoy engawtinî jimareyek le danîstuwaniya nawçeke. Le nawerastî mangî kewçêrî em sal firokaniya cengî Turkiya le başûrî Kurdistanê bordumanî gund û rêga û banekaniya dolî Balîsyanan kird, le encamî bordumaneke da bowe hoy kuştinî jimareyek kesî medenî.

### Cerd û pêkutî

Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) ya Mêrsînê roja 2'ê Sermawezê ji hêla polisên terorê ve di dema listika "Teatra Jiyana Nû" a bi navê "Rojbas" de hate dorpeçkirin û pişt re jî hate dagirkirin. Di bûyerê de jî rayedar û endamên NÇM'ê 9 kesên ku hatibûn binçavkirin, roja 4 sermawezê derxistin dadgehê. Pişt re Serokê NÇM'ya Mêrsînê Servet Özman û Endamê Teatra Jiyana Nû Kemal Ulusoy hatin girtin û ew şandin Girtîgeha Mêrsînê.

### Qetlîama leşkeran

Hêzên dewletê ku ji 2000 cerdevan, tîmên taybet û leşkeran pêk dihat; roja 30'ê kewçêrê avêtin ser gundê Mizêya Xana Hewel (Baykan) a Sêrtê. Di şer de du leşker hatin kuştin, gelek leşker jî birîndar bûn. Piştî vî yekê hêzên leşkerî kadîna ku gerilayan xwe tê de veşartibûn bi çekên giran şewitandin, çar gerilayan di vî bûyerê de can dan. Leşkeran jî bo tohildanê gundiyan bi navê Abdulhalik Körpe û Abdulfafar Körpe kuştin.

### Sozên pûç

Rojnameya navdar a emerîkî New York Times di nivîseke xwe de bal kişand ser rewşa Tirkiye û Kurdistanê. Diavê nivîsê de tê gotin ku sozên Tirkiyeyê yê ji bo mafên, ramanên azadî û realîteya kurdan pûç derketine û nehatine cih. Di vî nivîsa ku ji hêla Stephan Kinzer ve hatiye nivîsandin de jî tê gotin ku Eşber Yağmurdereliyê ku berê 14 salan di girtîgehan de maye, ji bo ku behsa kurdan kiriye, hatiye cezakirin, niha divê cezayê xwe yê berê jî bikişîne.



# Jiyanek bi êş û elem: Mîr Celadet Alî Bedirxan



## OSMAN ÖZÇELİK

Panzdehê tirmehê, salvegera 46'an ya wefata Mîr Celadet Alî Bedirxan bû. Weşanxaneyê Avesta karekî gelekî qenc û pîroz kir û di vê salvegerê de, du pirtûkên Mîr Celadet weşandin. Yek bi frensî û tirkî (De La Question Kurde-Kürt sorunu üzeretine) "Li ser pirsgerêka Kurd" bû. Ya din jî, bi tirkî Günlük Notlar 1922-1925 (Notên Rojane yên 1922-1925) bû.

Mîr Celadet, di dîroka Kurdistanê ye nêzik de, ronakbîrekî neqane, zimanzanekî bijarte û serwerekî birêz bû. Ji bîrkirina wî, mîna windakirina şîtra dîrokê ye.

Ez dixwazim di vê nivîsê de li ser pirtûka "Notên Rojane 1922-1925" ku bi tirkî hatiye nivîsîn, rawestim. Berî her tiştî weşanxaneyê ev pirtûk bêkêmanî weşandiye. Kaxiz, çap, berg, cild dirûn ewqas paqij amade bûye ku, mirov weşanxaneyê efû dikê ku, pirtûka

"Bîra Qederê" ya Mehmet Uzun ku bi formê romanê jiyana Mîr Celadet tê de ye, herimandibû.

Mîna ji navê pirtûkê tê fêhm kirin, pirtûk ji notên rojane yên Mîr Celadet Alî Bedirxan -yên di navbera salên 1922-1925 an de, ku li Mûniha Almanayê jiyaye, pêk hatiye.

Di ebediyata dinyayê de notên rojane, di sedsala bîstan de cihê xwe digirin û nivîskarên fransî yên wekî P. Leautaud, Eugene Dabit, Stendhall, André Gide ev formê edebiyatê bi xwendevanan didin hezkirin.

Ji me re, di edebiyat kurdan de Celadet, mîna gelek tiştî di vî warî de ji serkêşî kiriye.

Di vê formê edebiyatê de; li ser edebiyat, felsefe, huner û jiyana rojane nivîskar her roj, an jî, ji çend rojan carekê dîtî û hestên xwe bi zimanekî sivik û bi stîleke bêrewnaq dinivîsin. Di notên rojane de, li xwe mikur hatina ji dil heye. Divê nivîskar ji dil û can be. Ango samîmî be. Notên rojane yên bi "hesab û kitêb" hatine nivîsîn, qet ne meq-

Ji pênuşa Celadet Bedirxan li Munîhê mêjûya 1'ê sermaweza 1922'yan: "... Ez bibêjim li hundirê odê jî berf dibare ne derew e. Çenteyek di destê me de, em derî bi derî li komirê digerin.

Me jî nasekî Tewfiq 12 parçe komir kirîn. Em hatin gund. Em çûn xwaringeha gund. Armanca me, em komirê bihêlin sibê."

bûl in. Jixwe notên rojane yên herî ji dil, pirtirîn piştî mirina nivîskar tîn weşandin. Û hindek ji wan di tama şîr û şekir de ne. Ji van yek nivîsên André Gide (Paris 1869-1951) ê ku di sala 1947'an de xelata Nobel wergirtine. André Gide, li ser deftera xwe, di roja 31.12.1891'ê de wiha gotiye: "Ku mirov dest bi nivîsa notên rojane kir, mijara herî dijwar ku li pêşiya mirov e; jidilbûn e." André Gide, yek caran notên xwe yên rojên derbasbûyî dixwîne û têdigihêje ku li ser gelek mijaran dîtî û ramanên wî hatine guhartin û carinan ji defterên xwe çend rûpelan diqetîne, diçirîne û diavêje. Carinan jî dibêje min defter hemû şewitand. Yek caran notên nû li ber notên xwe dinivîsine û tew he nekê xwe bi dîtînen xwe yên çend sal an çend meh berê dike û xwe wekî "xurif" dibîne. Hindek notên A. Gide li ser bûyerên rojane bin jî, pirtirên notên wî filozofî ne.

Her notek ceribandinek e. Ceribandineke edebî. Di notek xwe de wiha gotiye: "Ji çar paran sê parên jiyana mirov, bi amadekirina jiyaneke şad derbas dibe. Belê ev nayê wê maneyê ku, para mayin di nava şahiyê de derbas dibe.

Mîr Celadet Alî Bedirxan pisporê; felsefe, muzîka klasîk, dîrok û edebiyatê be jî, bi şeweyekî zehf sade, qala kirînen xwe yên rojane û jiyana xwe ya bêkeys û bêsiûd ya li Munîhê dike.

## Mîrê şikestî û nefibûyî

Bi xwezayî mirov bi dîroka kurdan, bi dîroka Mîrê Cizîra Botan; Bedirxan Paşa nizanibe, mirov trajediya Bedirxaniyan nizanibe, notên Mîr Celadet çiqas bi tesîr bin jî, mirov rind fêhm nake ku bê çilo jiyaneke serdest diqulupe trajediyekê û paşê dibe drameke ku kezeba mirov dihelîne.

Piştî ku hêzên Mîr Bedirxan li hemberî Osmaniyan dişkên, malbata Bedirxaniyan ji Kurdistanê tîne koçberkirin. Pirtirên wan li Stenbolê bi cih dibin û hindek ji wan, ji Stenbolê diçin Misrê û Sûriyeyê (Şamê). Mîr bi xwe sirgûnî

girava Girîtê dibe.

Emîn Alî Beg, kurê Mîr Bedirxan, bavê Mîr Celadet Alî Bedirxan e. Emîn Alî Beg welatparêzekî yekta ye. Her çiqas Bedirxanî di şerê neteweyî de tîk çûbin û malbat şikestiyê şer be jî, dewleta Osmanî hem li gorî xalên peymana şer rawestanê û hem jî, ji bo Mîrê kurdan bi xwe ve qenc girêde li Stenbolê gelek îmkan dane wan. Emîn Alî Beg û jina wî ya duyemîn Semîha Xanim, li Kadiköya Stenbolê di qonaxek sê tebeq de dijîn. Bi carî û xizmetkar in. Semîha Xanim li ber destê diya Emîn Alî Beg, Rewşen Xanimê cariyê ye. Piştî ku jina Emîn Alî Beg dimire ku bi navê Sureya kurek jê dimîne, beg bi cariyekê re dizewice. Ji Semîha Xanim, Celadet, Kamûran, Hîkmet, Tewfiq, Safer û Bedirxan tîn dinyayê.

Têkiliyên Bedirxaniyan bi Dewletê Osmanî Alî re nerm û bi bal in. Dewleta Osmanî Alî nişana liyaqatê dide Emîn Alî Beg û spasiyên xwe pêşkêş dike. Di wan rojan de apekî Celadet di seraya Osmanî de dixebitê û gelekî nêzî padîşahê Osmanî ye.

Celadet di rewşek wisa de mezin dibe. Emîn Alî Beg, amojna Sifî kiriyê mamosteyê zarokên xwe ku wan hîrf ziman, çand û rabûn û rûniştina kurdî bike, ji welêt dengbêj tîn vexwendin û bi kilamên kurdî ruhê zarokên Bedirxaniyan tê avdan. Amojna Sifî ezîdiya Botanê bûye û ji bav û kalan di mala Mîr Bedirxan de mezin bûye. Amojna Sifî jî piştî şikestê bi Mîr Bedirxan re diçe, girava Girîtê û heta sala 1862'yan li wir dimîne û piştî Mîr Bedirxan ji Grîtê diçe Şamê, ew jî tê Stenbolê. Celadet û birayên wî ji malê ruhê kurdayetiyê digirin û ji mektebên dewletê fêrî zanistiyê dibin.

Apê Celadet Miqdat Mîthath di Misrê rojnameya Kurdistanê de Miqdat gazî kurdan dikir ku ew hişyar bin û doza welatê xwe bikin. Celadet û birayên wî tevî dabû şer şopa apê xwe Miqdat û bavê xwe Emîn Alî Beg.




## Jiyana kambax a li Munihê

Îttîhad Terakkî û paşê jî Mustafa Kemal radibe, jiyana Bedirxaniyan roj bi roj zehmetir û diwartir dibe. Safter û Tewfîq diçin Munihê. Dû re jî Celadet û Kamûran bi rê dikevin. Ji wê rojê şûn de bayê qedere çep digere. Kurên aristokratên kurd, neviyên Mîrê Kurdistanê, li welatê xeribiyê xwe di nav jiyaneke bêkar, birçî, sar û tazî de dibinin.

Li Munihê Kamûran, doktoraya hiqûqê dike, Safter kîmya xwendiyê, dest bi pisporiya kîmyayê kiriye, Tewfîq bûye muhendîsê daristanê. Celadet dersên ziman, çand û siyasetê dixwîne. Charles Baudlaire, Victor Hugo, Lamartîne dixwîne, xwe digihîne kûraniya felsefeya Nietzsche, Goethe, Bismarc bi berhemên xwe dikevin jiyana Celadet.

Deftera bi destnivîs notên rojane tê de, jina Celadet Rûşen Xanim dide. Konê Reş û ew jî dide Mahmûd Lewendî, jî wî ji digihêje Malmisanîj û tê weşandin. Nota Yekemîn di 26'ê rezbera 1922'yan de hatiye nivîsîn. Nota paşîn jî di 25'ê gulana 1925'an de qeyd bûye. Temama wan ji rêzîkê heta rûpelekê 137 not'în. Di rojen pêşiyê de Celadet û Kamûran pere û zêrên xwe bi markên almanî diguherin. Aboriya Almanya piştî şerê cihanê ketiye tengasiyeke mezin. Qîmeta markan roj bi roj dikeve, enflasyoneke nedîtî heye. Di çend mehan de perê wan diqedin. Tu



Celadet Alî Bedirxan û birayên xwe Süreyya û Kamran bi hev re tînin dîtî

kar jî nîn e. Almanya serobino bûye. Di nava tunebûna û birçîbûnê de bin jî, ne her roj be jî, ji çend rojan carekê diçin konserên mûzîka klasîk. Birçîbûna zîkê xwe bi konserên Richard Strauss, bi muzîka Mozart jî têr dikin. Li mûze û pêşangehê wênayan êşa bêmalî û bêwelatîyê di ser guhê xwe re diavêjin.

1.11.1922'an bixwînin: "... Ez bibêjim li hundirê odê jî berf dibare ne derew e. Çenteyek di destê me de, em derî bi derî li komirê digerin. Me ji nasekî Tewfîq 12 parçe komir kirin. Em ha-

tin gund. Em çûn xwaringeha gund. Armanca me, em komirê bihêlin sibê."

Notînin din 12 adar 1923: "Min odeyek kirê kir. Ne ode, sefaletxane ye. Şîbakên odê tunene. Ode tarî ye û her dem şev e." 18 adar 1923: "Ev bû deher ku ez cixarê nakirim. Min ji mêj ve xatirê xwe ji birayê xwestiye..." 14 Tîrmeh 1923: "Hema hema perê min neman. Tu cihê ku jê ji min re pere werin tune. Dîtina karekî jî bê îmkân e. Her çiqas ez xwarinê bi xwediyê malê re dixwim jî, êdî ez tenê dikarim bibim

şîrîkê xwarina kartol û şenkahiyê. Ez nikarim bibim şîrîkê xwarina goşt." 25 Tîrmeh 1923: "Yek dolar bû 620 hezar mark. Ketina aboriya Almanya bi min jî giran tê. Teva vê bêperebûna min naxwazim ji enflasyonê îstîfade bikim."

31. Tebax 1923: "Dolarek bûye 12 milyon mark. 13.11.1923 min nikarî heqê mektebê bida, lewre ez jê hatim avêtin. Sibê ezê pantorê xwe yê reş yê dawiyê bifiroşim." 17 rezber 1924: "Ez qayil bûm ku karê herî giran bikim, belê ew ji bi dest min neket."

Bi mirina Safter, Celadet zehf diêşe. Paşê Mustafa Kemal meaşê bavê wî dibire. Bêkar û bêpere ye. Vegera wî ya Stenbolê jî hatiye qedexekirin.

Celadet berê xwe dide Misrê û ji wir diçe Şamê. Xebata Xoybûn, serhildana Agirî, rojnameya Hawar. Xebat, xebata azadiya welat. Bi Roger Lescot re xebata "Gramera kurdî".

Jiyanek bi êş û elem, lê belê serfiraz di rojê germ a havîna Şamê de li ser bîrêkê avê diqede.


**Çavkanî:** — *Günlük (A. Gide) Milli Eğitim Basimevi-1993*

— *Bîra Qederê (M. Uzun), Avesta*

— *Günlük notlar (1922-1924) Celadet Alî Bedirxan, Avesta- Meydan Larouse.*

## Gur, dema dikevin tengasiyê hovtir dibin

CELALETTİN YÖYLER



Li welatê me di demsala zivistanê di meha reşemiyê de gur li hev dicivin û bi hev re digerin. Ji ber kû zivistanê Kurdistanê dirêj dikişîne, gur bêxwarin dimînin. Lewre jî ew pêwîstiya bi hev re geranê û êrîşkirina ser gundan û wargehên jîndaran dibînin da ku ji xwe re hin xwarinan bi dest bixin.

A ji bo vê rewşa hevgerîna guran di vî demsalê de, kesên li wan deveran ji tîrsa êrîşên wan ên bi hev re, bi tenê û yekane li çolan û rîyan nagerin. Heger yek ji keşan bi tenê û serê xwe rastî tibêka guran were, gur wî par parî dikin û dixwin. Di nav gelê de êrîşa gurên meha reşemiyê navdar e. Hem jî dîsa di nav gelê de, dibêjin di çileyê yekemîn de demsala zivistanê de ji ber dijwariya sermayê gur xwîne dimîzin.

Dîsa li welatê me di demsala zivistanê

de gel bi hespan nêçira guran dikin. Di vî nêçirê de dema, nêçîrvan, bi beza hespê xwe gur diwestîne û darê xwe yê di ber paqa xwe de dikişîne û diteqlîne û ji jor ve dixwazê ku bîne ser poz û şilika nêçîra xwe. Wê demê gur lê dizivire û radibe ser her du piyên xwe yê dawiyê û xwe amade dike ji bo êrîşkirina ser nêçîrvan. Pîrî caran xwe davêje singê hespê nêçîrvan û hesp birîndar dike. Carinan jî, xwe diavêje nêçîrvan bi xwe jî birîndar dike.

Em werin ser rewşa çelîkên guran yê dupê, ew jî wekî bav û bapîrên xwe yê çarpê, ketine nav givaştina şoreşa gelê me û şoreşgerên gelê kurd ên tirk, di nêzik de ew jî wê wekî bapîrên xwe yê çarpê, xwîne bimîzin. Hem jî di nêzik de wê bikevine ber çoyên nêçîrvanên şoreşgerên her du gelan û derbeyên mezin li pozên wan bikevin.

Rejîma nijadperest û guran çiqas di nav raya Tirkiye û cîhanê de bête eşkerekirin û nasandin, ewqas wê kuştî û êrîşkeriya xwe derxine holê. Êrîş bike ser kesên rewşenbîr û nivîskar û şoreşger. Wekî çawa ku nijadperestê dijminê gelê kurd serokê bajarvaniya bajarê Îzmîrê Burhan Özfatura nijadperestiya xwe

eşkere dike û êrîş ser nivîskarê mezin Yaşar Kemal dike û her wisa êrîş ser parêzkarê mafên mirovan û aşîxwazê. Hêja Eşber Yağmurdereli dike û qîlên xwe bi hev ve dişidîne û diçewke.

Em vî êrîşa Özfatura û yê nijadperestên wekî wî, ya li ser rewşenbîr û parêzvanên mafên mirovan û aşîxwazên wekî birêz Eşber Yağmurdereli û li ser nivîskarê mezin Yaşar Kemal perîşaniya herî mezin ji bo rejîma kontra û guran dibînin û dinixînin.

Lewre gur hetanî nekeve radeya mirinê û tengasiya herî mezin, li nêçîrvanê xwe nazivire û êrîş nakê. Bi rastî ev mînakeke pir watedar û balkêş e, ji bo êrîşa nijadperestan li ser mirovahiyê. Lewre van nijadperestan ji destpêka damezrandina rejîma xwe heta vî rojê her tim dizî, talan û xwînrijandinên xwe, bi rewşekî binfîskî û veşartî li ser kedkarên tirk û yê her kesê ku di destê vî dewletê de ne didan meşandin. Lê îro li ber çavê herkesî diyar e ku ev rejîma nijadperest ne dostê bindest û karkeran e. Ji ber van rastiyan rejîm ji vir pê ve wê bêhtir êrîşker û xwînrej be. Wê demê divê kesên şoreşger û welatparêz û gemariya nijadperestan bizanin û li hemberî rawestin û amade bin.



# Fermandar Delîl, Şehîd Orhan Tekiner



**H**estiya, Kerteşa Biçûk, Kerteşa mezin, Qûlû, Helac jew rêzdê. Nê nameyê dewanê kîşta Qerejdaxê, Sêwreg ra vîst, vîst û panç kilometrey duriyê. Ez nê dewan rind silasnena, çimke ez xo jî dewa Kerteşa Mezin ge ameya dinya. Wexto ke ez werdîbiya, her gi roj artêşa tirkân ra qomandoy ameyê na dew ser. Qomandoyan zey wahşan dayê dewijan ro. Qeçekî kêberan pey de, tersê înan ra lerzayê lerzayê û pay kewtê. Nika jî, wexto ke çiyê nîno ma vîrî, ma pêrê vanê: "Çend serî, verê sera qomandoyan, yan jî çend serî bahdoyê sera qomandoyan?" Yanê a ser ma rê bibî sera mîladî. Zek yeno mi vîrî, şarî vatê kominîstan ra İbrahim Kaypakkaya ameyo no heren, coka dewleta qomandoyan rêşena nê dewan ser. Nezdiyê vîst serî tepya, no fin gerîlayê reyayîna şarê Kurdistanî ameybî no herem. İnan ra jew jî Embaz Orhan Tekiner bi.

Mi embaz Orhan, Stanbol de yûrdê AOS di silasnabi. Orhan şaristana Sêwreg ra bi. Ey kîştê ra fakultawa aboriya, Zankeyê Stanbol de, wendê û kîştê ra jî maliye de karmedin kerdê. Wendox û karmend embaz Orhanî keftiyayê xo yo esasî şoreşî sero kerdê berz. Orhan fakûlta xo de, miqayetê (persbenoyê) wendoxanê welatweran bi. Siyaset û kulturî sero zaf zanekar û weşîna xo ya jî heskerde

bi. Welatperweran tenya nê, kamiya embazî kerdê, înan eyra heskerdê. Mabendê ey û karmendanê bînan jî, tim û tim weşbi. Xulqê ey ra, merdim zaf biyê kêfweş. Karmendê ke, eya embazî kerdê, ci ra wina vatê: "Ti merdimê nê dinyay niyê, hind zelal û akerde mebi. Wexto ke, ma to ya vejyenê kar, ma nêşenê çewtin bîkrê. Çimke ma yê weşîna to ra şermayenê."

Embaz Orhan aborî û siyasetê Kurdistanê sero zaf zanabi. Wexto ke, mesel ameyê aborî ser, embazan veyn-dayê ey. Wendoxan hemin jî siyasetê ma weş ardê ziwana, la belê rewşê aboriya Kurdistanî sero nêşayê fikranê xo hend weş biyarê ziwana. Çimke aborî heveya zanekarî waştê. Şewê ma wendoê ke welatperweriyê hewşê yûrdoî de arêbyayê pêser û aborî sero qisey kerdî. A şew embazan keylê, çî erdê ziwana, la belê qiseyê peynî embaz Orhanî ardî. Hendo ke yeno mi vîrî, ey aboriya bandorkaran û serdestan wina ardbî ziwana: "Bandokar û serdestî aboriya welatê ke bindestê înan nak ra girêdenê xo ya û di finî ci-ra mexel (ürün) genê. Mexelê merdiman ra hu mexelê jî şarîfî ra (ulustan) genê. Bandorkarî waxto ke nê mexelan genê, nêwazenê şarîtiyo bindest û merdimê ci, vinîbê, yan jî bîmrê. Çimke ê şaritan û merdimanê ci sermayayê bandorkaran kenê mird. Dinya de rewşê şarîtiyê ke bindestê winayê. Ancî Kurdistan de

na girêdayin de çîna (teveya) esto. A jî naya, bandorkarê ke, Kurdistan vîsto destanê xo dest, şarîfî û merdimanê ci rêçik ra înkâr kenê û kenê vinî. Goreyê înan, dinya de kurd û Kurdistan çiniyo. Wexto ke kurd û Kurdistan çinêbo, sermayeyê ci jî nêbeno. Sermayeyo ke ewro Kurdistan de ro, ê ereban o, ece-man o, û ê tirkân o. Coka nêveradayê sermayeyê Kurdistanê bêro pêser û nameyê ciya bêro silasnayin. Wexto ke, şermaye bibo xora şarîfî jî beno. Kamo ke vano bûrjûwaziye kurdan jî esto, raşt nêvano. Ek bûrjûwaziye ma bibiyayê, înan jî qandê reyayîna welatê xo lec kerdê. La belê dîroka ma de, lece bûrjûwaziyan çiniyo. Şoreşê sovyetî ra na kîşt jî sosyalistî newe newe verniya reyayîne welatê ma de ca genê. No reyayîno jî partiya karkerana niyeno ro. Ewro partiya karkerana, ma kurdan mezela ra vejena, gerek ma nay rind bizanê."

Embaz Orhanî weşîna xo ya û zanayîno xo ya keylê ci mûsnayê embazanê xo. Ey ciyê jî xo pîze de nêtepiştê. Pirtûkî, rojnamey û kovarî wendê û înan ra mijarî vetê. Çend ke ci dest ra ameyê, şiyê sînema, tiyatroy û panelan. Çimke o roşnikar bi. Ey roj bi roj siyasetê bandorkaran sero vînayîni vetê û rewşê înan ardê çîman ver.

Sera 1991 de şî Sêwreg û malbata xo ard Stanbol û peyra jî vejya teber. Malbat de jî sermiyan embaz Orhan bi. Ey se vatê malbata ci winî kerdê. Wexto ke şiyoy teber malbata xo ra xatir waştoy û wina vato: "Ezo şîna, la belê

şîma zanê ke bandorkarana bê lecê çekî, rayê jî ma vernî de nêviradawa, ez zana ke şîmayê mi verkewê, ancî ez bawer kena şîma jî zanê bê nay rayna çiniya. bîmanê weşîde û xatir de şîma."

Embaz Orhan, de serî tepya beno fermandarê gerîla û yeno Sêwreg. Sêwreg de dew dew geeyreno û şarî miyan de keftiyayîno gird dano. Şar ey ra, o şarî ra zerî geno û xebatanê şoreşî wijade her gi roj keno berz Rojê piyê ci, Ded Elî mûsyeno ke Orhan ameyo Sêwreg. Ded Elî wazenoy leteyê zerya xo Orhanî, çînayê gerîlaya finê bivîno û coka jî dano pîro şîno Sêwreg. Wexto ke şîno Sêwreg, polisî ey "Kerteşa Mezin" ra jew dewijîya piya tepşenê û înan benê dew. Polisê taybetî, leşkerî û caşîna piya na dew rê vardayin virazenê. Qeç û qûlî, cinî û mêrdekanê, Kerteşa Mezin dibistanê dew de arêkenê pêser. Dişmen hindê heftayê Ded Elî û diwijan rê îşkence kenê. No mabende dewijî vanê nika gerîlayan xeber giroto û wîja ra kewtê dûrî, qandê coya cawo ke gerîlayan xo nimnabi ê cay vanê. Nê vatenan peyra leşkerî, ê cay rê vardayîno gird virazenê û mabendê înan û gerîlayande lec vejyeno. La belê gerîlayê reyayîne şarê Kurdistanê erdo dûz de, kozikî miyan de leco gird danê û peyniyê lecî de, sereyê xo bombaya destî sero nanê ro teqnenê û 25'ê menga desine 1993 de embaz Orhan, Evdîrehman Turk û jew embazo Erqeniyîjî ya piya şehîd kewtî û bi astarika şoreşê Kurdistanî.

ZÜLKÜF KIŞANAK

Ronakbîr ew kes e ku wekî çirayekê pêşîya gelê xwe ronî dike.

Hevala Gurbetellî Ersöz yek ji wan ronakbîran e ku xwe ji bo gelê xwe kiriye tofana ronahiyê.

Ew sembola rûmet û berxwedanê ye, Bîranîna wê, dê her gav sonda me ya têkoşînê be.



Gurbetelli Ersöz

Hevala Gurbetellî di nav dil û mêjiyê me de dijî.


İNSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ



□ 12 Sernawez 1948:

**Helbestvan Dildar çû ser heqîya xwe**

Nivîskar û helbestvanê şoreşger Dildar di sala 1918'an de li bajarê Koysençaqê li gundê Hecî Qadirê Koyî hat dinyayê. Dema di sala 1946'an de Komara Kurdistanê ya Mehabadê tê damezrandin helbesta wî Ey Reqîb dibe sîrûda ciwanan ji bo komarê. Lê paşê ew li nav gel wekî "Sîrûda neteweyî" belav dibe. Heta niha jî ev sîrûd ji bo kurdan wekî "Sîrûda neteweyî" tê pejirandin. Navê rastîn ê Dildar, Yûnis Raûf e. Di sala 1948'an de di 30 salîya xwe de ji nav me koç dike.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

□ 12 Sernawez 1994:

**Medet Serhat hate qetilkirin.**

Rewşenbîr û Ebûqatê kurd Medet Serhat tevî pîreka wî Yurdanur Serhat û şofêrê wî İsmail Karaalioglu li Stenbolê ji hêla kontrayan ve hatin-gulebarankirin. Di vî kiriyara hovane de Medet Serhat û İsmail Karaalioglu hate kuştin. Yurdanur Kaya jî ji bi awayekî xedar birîndar bû. Medet Serhad di sala 1935'an de li İdirê hate dinê. Di 17'ê berfanbara 1959'an de jî "Doza 49'an hate darizandin

## Axînek ji kezebê: Dengbêj Mahmud Kızıl

"Gelî xwişk û bira derdê me pir e, kulê me giran e  
Çavê me kor e, hiş û aqil li serê me neman e  
Welehî em nas nakin me dixapîne, em rayên xwe didin wan e  
Dibên emê bibin mîletwekîlî herin Enqerê;  
ji bo daw û dozên giran e  
Wê me bikin xwedî fabriqe, av û elektrîk,  
rê û cade, doxtor û xestexanan e  
Vekin deriyê hepsan e, bînin efûya fîrar û mehkûm û qûşkuran e

Wê me xilas kin ji îşê alman e.  
Diherin Enqerê rûdinin ser koltixa, enişkên xwe didin ser masan e.  
Dibêjin gelî hevalan, heta pênc salan tu îşê me bi gundî û feqîra nema ne  
Gunê me temama di stûyê mîletwekîlan e  
Ûmîda feqîran li jêr nema ne, li jor tenê maye rebê rehman e"  
(Ji kilama Wekîlên Me)



Xwediyê van gotinên jorê, dengbêj Mahmud Kızıl e. Mahmud Kızıl yek ji navdartirîn dengbêjê herêma Diyarbakirê ye. Ew bi xwe ji navçeya Hezroyê ye. Dengbêj Kızıl ji bo Navenda Çanda Mezopotamyayê dawî li bédengiya xwe ya 20 salan anî. Demek berê di vekirina NÇM'ya Amed û Rihayê de bi kilam û lawikên xwe derketibû pêşberî gel û ew coşandibûn.

Cara dawî roja 2'ê sernawezê dengbêj Mahmud Kızıl bi kincên xwe yê neteweyî li şaxa NÇM'ya Stenbolê konserek pêşkêş kir. Mahmud Kızıl bêhtir 2 saet li ser sehnê kilamên bi navê "Were Bêmal", "Keçê Dîne", "Cembeliyê Mîrê Hekarî", "Keçika Qereçî", "Siwaro", "Kuro lawiko", "Lawikê Daqorî" bi dengê zîz û zelal gotin. Bi taybetî kilama folkrolîk "Nazewicim", kilama ku ji bo durûtiyên parlamenteran çekiribû "Wekîlên me!", kilama li ser zam û giraniyê "Garisê Feqîran" kilama ku İbrahim Tatlıses werge-

randiyê tirkî û xwendiyê "Lê, lê lê lê Emîne" û kilama parlamenterê Amedê, Wezîrê Tendûristiyê ku li nav gel gelek dihat hezkirin "Dr.Yusuf Azizoglu" ji hêla temaşevan û beşdarên ve geleki hate ecibandin û bûn sedema çepik-lêxistina beşdarên.


Ji bo konserên dengbêjan çavdêriyê balkêş jî ev e ku; temaşevan û beşdar, dengbêj ji kîjan herêmê be, ew jî ji heman herêmê ne. Lewre ku Dengbêj "Salihê Qubîne" jî demek berê li NÇM'ê konserek dabû, beşdar bi piranî ji Qubîne, Batmanê û Misircê bûn. Di konsera Mahmud Kızıl de jî em dikarin bibêjin ku temaşevan bi piranî ji Farqînê, Hezroyê û ji Bismila Amedê bûn.

Di konserê de bi tembûra xwe Hozan Hogir û bi meya xwe Güngör Oktay alîkarî û piştewaniya Dengbêj Mahmud Kızıl kirin. Bi qasî sed kesî beşdarî konserê bûbûn.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

**ÇAVDÊRÎ**

### Rewşa welat û neteweya Susurlukê



MİRHEM YİĞİT

Em nêzîkî dawîya sala 1997'an dibin. Di meqaleya vê hefteyê de em dikarin hinek ji hevokên ku di van çend salên dawî de di rojnameyên tirk de berçav dibin, hest û hisên berdevkên dewleta tirk ku xwe didin der, wêne û tabloyeke rewşa civata Susurlukî darêsin. "Neteweya tirk di tûnelekê re derbas dibe. Tu dibêji qey kabûsek pêl bi pêl Tirkiyeyê radipêçe. Atmosfereke giran giş sinîrên civatê rehîngirtine. Li her derê bêhtengî û pêsirtengî raser e. Ev mengeneya lanetê ye..." (Sedat Ergin)

Parlamentê û partayetî bûye organê çûr û talanê, xwedewlemendkirin û xweqelewkerinê. Giş parlamenter bûne bazirgan û îş û karê wan mane çelp. Her yek maye li ber ya xwe û kes serê xwe bi derdê mîlet re naêşîne, xwe mijûl nake. Dinya ji bo wan çî difikire ne xema wan e. Avê di zikê xwe de naçelqîn û giş dinya bişewite baqek pûşê wan li ber nare. Kêfkêfa wan e, ne bi min e û ne bi te ye.

Travma û şizofreniyêke rûhî roj bi roj refekî din ji mirovên civata Tirkiyeyê dikişîne nav xwe. Bi vî halî û bi vî rewşê Ewropa dê çawa Tirkiyeyê bihewîne nav xwe û di nav xwe de cih bide.

Dizî û keleşî li qirikê ye, mafyatî ketiye her deverê. Di nav polis de, di nav meclîsê de, di nav artêşê de û di nav giş organên dewletê de cihê xwe çekirine, bûne demarên serekî. Susurluk êdî ne navê bajarekî ye. Bûye sembola qirêj û lewta şerê taybetî. Sloganê aktûel li her deverê ev e: "Tirko kêfa xwe bik! Talan bik! Bikuji! Destên te ji te re ne, tu çî dîkê bik." (17 Berfanbar 1996, Ali Sirmen)

"Hûn baweriyê bi gotina tirkê beramberî dinyayê ye neyînin. Em giş bi qasî şifêrê kamyonekê nayên. Ji her alî marîfetên çeteyanî dirijê. Tiştê şifêrê kamyonê kir bi bêhemdî be jî bi milyonan tirk nikarin bikin." (Enis Berberoğlu)

"PKK'ê meseleya kurd navnetweyî kir. Kurd bûne hêzek heralî, hem leşkerî, siyasî û hem jî medyayî û diplomatîk." (Ertuğrul Özkök). "Nêzîka nivê bûtçeya Tirkiyeyê diçe ji meaşê karmendan re, de îca meaşê cerdavana jî têxin ser, ji bo pêşxistin û baştirkirina rewşa civatê tiştê zêde namîne." (Ermin Çölaşan).

"Siyasiyên tirk di nav diwarên ji goşt de diçin û tîni ji kuştina xwe û ji êrîşan ditirsin." Çu carî baweriyê xelkê ew çendî bi hikûmetê, partiyên siyasî û helbet ew çendî jî bi dewleta xwe neşkestiye û mîna îro ji rêveberiyê neketiye şikê. Tirkiye ketiye nav krîzê: "Ev krîz mezintirîn krîza cumhûriyetê ye. Ez pir paxav û mitalan dikim." (Bulent Ecevit). Sûcdar û gunehkar defterên hev vedikin, kaya hev didêrin. Cimexweşiya ku ji diplomat û siyasiyên tirk re çêbûye dê hê mezintir bibe û baweriyê bi meqam, polis, siyasî û rêveberên dewleta tirk ku li hundir û li derve şikestiye, diplomatên tirk dê qet careke din nikarin biciribînin.

"Mîna noqav û girê derkeve ser ruwê avê, çiyayê mîja li ser xwe ber de jêr, roja hewr xwe ji ber bide alî, her tişt ber şefeqtir û berbiçavtir dibe, qirêj û gomar derdikeve meydana." Û reş û spî ji nav hev derdikeve.

Di yekemîn salvegera bûyera Susurlukê de li hin bajarên Tirkiyeyê meş û xwepêşandan hatin lidaraxistin. Ev destpêkeke girîng e. Bûyerên dawî îspat dikin ku şerê li Kurdistanê gelê tirk jî polîtîze dike. Êdî xelk dê pirsgrêkên xwe li bendeyî zemên û Xwedê nahêle.



# Bûyera Susurlukê jî lîstikeke gladiyo ye

Daîreya îstixbaratê ya Serkaniya Giştî û lojmanên MÎT'ê jî çirayên xwe temirandine. Li gorî Suat Parlar ev bûyer gişk parçeyekî lîstika dewletêne, lê gel jî bi awayekî bûye aletê vê lîstika dewletê. Beşdarbûna sermayê jî berevajî kirina bûyeran û daxwaza generalan bû da ku dewlet kontrola xwe ya li ser çeteyan zêde bike.

**B**i kuştina karsaz û rojnâmege-  
rên kurd rasterast êşkere bû ku  
li Tirkîyeyê "gladiyo" yeke  
xurt li ser kar e. Bi taybetî çapemeniya muxalîf li ser vê bûyerê her tim sekinî. Bi dehan karsazên kurd û rojnameger ji aliyê gladiyoyê ve hatin kuştin. Kêma kesî daxuyand ku heta qetlîamên karsaz û rojnamegerên kurd diyar nebe çete û gladiyo jî êşkere nabin. Jixwe êşkerebûna wê jî ne mimkûn e. Her wiha hebûna gladiyoyê li Tirkîyeyê bi qezaya Susurlukê êşkere bû, lê êşkerebûna bûyerê li hojê pir pirs jî hiştin. Rojnameger û lêkolîneran dane zanîn ku jixwe "Gladiyo" ji salên 1970'an vir ve li Tirkîyeyê heye. Çete jî tetik-kêş û taşaronê wan ê rantiye û qetlîaman in. Êşkerebûna van çeteyan li ser daxwaza dewletê bû û dewletê xwest ku çeteyên di nav xwe de restore bike. Ji ber vê jî diviyabû ku hin çete bihatana tasfiyekirin, bi vê mebestê hin çete dane êşkerekirin.

Çapemeniya tirk bi rojan li ser vê bûyerê rawestiya, bi sedan belge û wêneyên kesên ku li gorî zagonên dewletê sîncdar in bi polîsan û fîman re weşandin. Lê tu encam derneket, ji bilî girtina çend fîmên taybet. Ew jî bi mebesta

Ömer Lütfü Topal kuştibûn, hatin girtin û kesê herî girîng di nav wan de İbrahim Şahin bû û ew jî di demeke kurt de hate berdan.

Li ser van îdia û salvegera bûyera Susurlukê li BEKSAV'ê di 1'ê sermawezê de panelek bi navê "Siya dewleta nehênî" (Derin devletîni izdüşümü) hate pêşkêşkirin. Axaftgerê panelê Parêzer û Lêkolîner Suat Parlar û Rojnameger Halil Nebiler bûn. Berî pêşîn Suat Parlar dest bi axaftinê kir. Parlar di destpêka axaftina xwe de pirsêk arasteyî beşdaran kir: 'Gelo me pirsên rast pirsîn?', mebest wê pirsê jî wiha êşkere kir: Baroya Stenbolê li ser bûyera Susurlukê dest bi amadekirina raporekê kiriye, ew rapor jî ji hêla Suat Parlar ve hatiye nivîsîn. Di destpêkê de pirs daxwazname hatine ber destê wî, yek ji wan jî ji bo Ferman Demirkol bûye. Ferman Demirkol di Zanîngeha Enqereyê de mamoste ye û pişeyeke wî jî ebûqatî ye, navê wî di nav kesên ku xwestine li Azarbeycanê darbeyê pêk bînin de, cih digire.

Parlar diyar dike ku heta niha generalên darbekar, sûbayên darbekar hatine dîtin, lê ebûqatên darbekar cara pêşîn tê dîtin. Parlar dibêje: "Gelo me li ser darbeya Azerbeycanê û Ferman Demirkol pirsên rast pirsîn. Ferman Demirkol kî ye? Çi têkiliya wî bi darbeyan heye? Ev bersiv wê rastiyekî bînine pêşberî me."

**Su-  
sur-  
luk  
res-  
to-**

## rasyona çeteyan bû

Parlar bal kişand ser kirinên li dijî vê bûyerê jî, bi taybetî jî çalakiya "Deqîqeyek tarî, ji bo ronahiyeke domdar", paşê wî diyar kir ku kesên wekî Sabancı û Alaton ku herî zêde piştgiriya şer dikin û alîkariya dewletê dikin jî beşdarî vê livbaziye bûne. Ji xeynî wan Daîreya îstixbaratê ya Serkaniya Giştî û lojmanên MÎT'ê jî çirayên xwe temirandine. Li gorî Parlar ev bûyer gişk parçeyekî lîstika dewletê ne, lê gel jî bi awayekî bûye aletê vê lîstika dewletê. Beşdarbûna sermayê jî berevajî kirina bûyeran û daxwaza generalan bû da ku dewlet kontrola xwe ya li ser çeteyan zêde bike.

## Çapemeniyê jî gel xapand

Parlar helwesta çapemeniyê ya li hemberî bûyera Susurlukê jî nixand. Li gorî Parlar, piştî bûyerê jî nişka ve kesên wekî Avni Özgürel û faşîstên kevn ku demekê berê mîltanê MHP'ê bûne, ji bin baskê pawan (tekel) de ji nişka ve rojnameyên bi rengên çepgir derxistin û bûne serkêşên êşkerekirina bûyera Susurlukê. Parlar axaftina xwe wiha domand: "Susurluk îşaretek bû, ji bo sermayedaran da ku di pêvajoya şerê qirêjî de xwe paqij bikin. Ji bo ku dewlet di nav xwe de restorasyonê xurt pêk bîne û bikaribe di rojên pêş de rê li ber hêzên mûxalîf û hişyarbûna gel bigire."

## Çete taşeron a gladiyoyê ne

Suat Parlar li ser rastiya gladiyoya Tirkîyeyê û kuştinên "kiryar nediyar" jî agahiyên balkêş dan. Parlar dide xuyakirin ku di sala 1995'an de dema ku Tarık Ümit hatiye revandin, rojnameya Meydanê nivîsandiye ku Abdullah Çatlı Tarık Ümit revandiye. Li gorî Parlar her tişt kifş bû, Abdullah Çatlı li Tirkîyeyê bû, her tişt bi destê wî pêk dihat û her kesî jî dizanibû ew li ku ye û karê narkotîkê jî bi destê wî dihate kirin.

Parlar li ser narkotîka ku gladiyoya Tirkîye difiroşe û dahatûyên wê ku pê şer dimeşîne jî ev agahî dan: "Di tîrmeha 1996'an de OECD'yê li Tirkîyeyê civînek pêkanî. Armanca wê civînê jî ev bû ku fonên ne legal ên li Tirkîyeyê bêne legalkirin, bû. Her çiqas tê gotin ku ev pere ji bazirganiya walîzan tê jî, lê li rastê 17 milyar dolar dahatûya zêde heye, ev qas jî ne karê bazirganiya walîzan



e. Li ser vê yekê Mehmet Ağar dema ku wezîrê karê edaletê bû zagonek ji bo pereyên kirêt derxist. Li MÎT'ê, li Serkaniya Giştî û li Musteşariya Karê Derve jî civîn pêk hatin.

Ev civîn ne civînen asayî bûn, min wê demê li ser van civînan di rojnameya Demokrasiyê de dinivîsî. Min daxuyand ku wê tasfiyeyên pir mezin çêbin. Di wê demê de bûyera Söylemezan derkete holê. Pişt re Mehmet Eymür ji bo civînekê çû Amerikayê, civîn li ser "Global Terörizm" bû. Di wê civînê de qerarek hate hildan: 'Ji vir pê di karê narkotîkê de MÎT- MOSAD- CIA wê bi hev re bixebitin.' Tiştê ku min ji wê fêhm kir ev bû wê karê narkotîkê bikeve destê dewletan, yanê wê ew narkotîkê kontrol bikin. Binihêrin di vir de meseleyek wiha çêbû. Berê pêşîn Söylemez wekî Gladiyoya Tirkîyeyê nişan dan çenebû, pişt re rapora Eymür derket, ew jî nebû, pişt re qezeya dewletê derket. Jixwe kesên ku pir pêş ve diçûn hatibûn îqazkin."

Lêkolîner Suat Parlar li ser politikaya ku dewlet bi taybetî li hemberî gel pêk tîne jî wiha got: "Çima dema ku failî meçhûl' pir bûn ev livbazî çenedibûn gelo? Deqîqeyek tarîfî, ji bo ronahiyeke domdar" jî lîstika dewletê bû. Wêkî tiştên ku me şîrove kirin." Li gorî Parlar ev manîpilyasyona çapemeniya kartel e, sedema vê yekê jî ew bû ku, pereyên biyan bi rêk û pêk biherikin bazara Tirkîyeyê û ew jî jê para xwe hildin. Parlar di dirêjîya axaftina xwe de wisa axivî: "Di destpêka 1997'an de 17 milyar dolar zêdehiya dowîz li Tirkîyeyê heye. bala xwe bidîne, her rojnameyekê televizyoneke wê bankayeke wê heye. Ev 17 milyar dolar gişk di bankayên wan de tê bikaranîn. Di van demên dawîn de sextekarê aştiyê Alaton û Sabancıyê ku bi me re lambeyê xwe difandin jî tevî ve sextekariyê û kirîtiyê ne."

## Piştgirê şer Weqfa TEMA'yê

Lêkolîner Suat Parlar li ser ranta şer û



manîpîlasyona ku ji aliyê rantiyê û saziyên qaşo sivîl ve pêk tên jî rawestiya. Parlar dadixuyîne ku hin liste di destê wî de hebûne. Holding û saziyên sivîl ku demekê pir alîkariya MHP'ê kirine, di wan listeyan de cih girtine. Di nav wan de Alaton û Sabancı jî hene û heta di Weqfa TEMA'yê de jî heye. Dîsa li gorî vê listeyê Weqfa TEMA'yê herî zêde alîkarî û piştgiriya şer kiriye û dike. Serokê Weqfa TEMA'yê Hayretin Karaca jî militanekî MHP'ê ye. Serokê Weqfa TEMA'yê Hayretin Karaca bi Yaşar Kemal re derxistina programeke TV'yê ev jî manîpîlasyona çapemeniyê bû. Berevajî kirina bûyeran û rastiyê veşartinbû. Li aliyê din Holdinga TEKFEN'ê îro li Tirkîyeyê holdinga ku herî zêde alîgiriye dide şer e. Dîsa Holdinga KOÇ îhaleyeke 525 milyon dolarî ji bo modernîzekirina tankan standiye. Lê îro ew radibin ji demokrasiyê û li cem gel cih girtinê qal dikin. Parlar wiha axivî: "Holdingên wekî Sabancı û Alaton jî di nav eynî karî de ne, lê dewlet bi riya wan bûyer û rastiyên pir baş manûpûle dike, berevajî dike, dewlet çawa dixwaze bûyeran wisa bi me bide fêmkirin."

**Darbeya Azerbeycanê û qetlîama Gazî**

Roja ku bûyera taxa Gazî dest pê dike, li Azerbeycanê darbeyek li hemberî Haydar Aliyev pêk tê. Têkiliya wan bûyeran jî Parlar wiha şîrove kir. Li gorî lêkolîna Parlar xeta neftê ji ber ku li Kurdistanê şer heye, Aliyev nexwestiye xeta neftê di Kurdistanê re derbas bibe. Li ser vê yekê dewleta nehênî xwest darbeyekê li wir pêk bîne. Ji vê re jî bûyereke ku bala dewletên din bikişîne pêwîst bû, ew jî taxa Gazî bû. Li gorî lêkolîna Parlar bûyera Sêwazê jî karê gladiyoyê. Wê demê PKK hêdî hêdî li Sêwazê bicîh dibû, daxwaza dewleta nehênî li wir bûyereki pêk bîne kesên welatparêz ji herêmê dûr bixe. Piştî bûyera Sêwazê bi hezaran kesên çepgir û welatparêz ji herêmê dûr ketine.

**Behra Reş jî wê wekî Kurdistanê be**

Li ser pirsêke "Gelo wê çûyîna geşîla ya Behra Reş çi encamê bîne ji bo herêmê?" jî Suat Parlar ev bersiv da: "Li Behra Reş bûyerên pir girîng pêk tên. General û waliyên ku li Kurdistanê xebat kirine, gişk şandine wê herêmê. Heta kesê ku wekî serokê çeteyekî tê binavkirin, yanê Tuğ. General Veli Küçük jî di civîna li Ordûyê de li kêlaka wezîrê karê hundirîn rûniştibû. Ew wekî berpîrsê gelek karên kirêt e, ji karê narkotîkê bigire heta faîlî meçhûlan. Ev jî nîşan dide ku dewletê xwest hem riya narkotîkê biguhere." Digel vê yekê jî Parlar diyar kir ku kevneşopeke şoreşgerî li herêmê heye û gelê herêmê bi piranî xwedî çek e, heke dewlet li herêmê karê çewt bike, wê bûyerên mezin biqewimin.

**Rewşenbîr İsmail Beşikçi ye**

Rojnamevanê Cumhuriyetê Halil Nebiler jî bi piranî li ser bîrêxistinbûna gel sekinî. Halil Nebiler diyar kir ku heta gel bîrêxistin be, wê dewlet bûyerên bi vî rengî pêk bîne. Giraniya vî barî jî li ser piştî rewşenbîran e. Nebiler diyar kir ku divê her kesê rewşenbîr wekî İsmail Beşikçi û Eşber Yağmurdereli tevbigere û helwesta xwe li hemberî dewletê û bûyeran zelal deyne holê. Ji ber ku tewra rewşenbîr rê nîşanî gel dide. Nebiler rexne li Yaşar Kemal jî girt û bi bîr xist ku heman xelat dane Beşikçi jî, lê wî ew xelat nepejirandiye û gotiye: "Dewleta ku çekên wê li welatê min ji bo qetilkirina mirovan tên bikaranîn, ez xelata wê dewletê qebûl nakim." Li gorî Nebiler diviyabû Yaşar Kemal jî ew xelat qebûl nekirina, ji ber ku helwesta rewşenbîr diyê sayî be.

M. AKSOY

35 hezar kes li Susurlukê civiyan

**Guh bidin dengê gel**



Roja yekê rezberê jî, gel bi çoşeke mezin berê xwe dabû Amedê. Herçiqas pîrsgirêk û astengî wê rojê derketibûn jî têrî kuştina hêviya gel a ji bo aştîyê nekiribû. Dîsa rojê ne dûrî wê rojê. Sisiyê sermawezê salvegera qezeya Susurlukê ye. Susurluka ku rûyê dewletê ye veşarî bi hemû aliyên wê raxiste ber çavên gel. Dîsa gel li otobûsan siwar bû û li qada Susurlukê nêzîkî sih û pênc hezar mirov gihîştin hev. Ew roj roja hesab pîrsînê bû ji bo gel. Jixwe gel jî di erebeyan de li benda saeta mitîngê bû. Di riya Susurlukê de çawa ku dema mirov diçe Kurdistanê, di sînorê Elazîzê de leşker dikevin pêşîya erebeyê, lêgerîneke hûrbînî dikin, li Kemalpaşaya Susurlukê yekemîn lêgerîn pêk hat. Taybetîyeke vî cihî jî hebû, qezeya navdar li vir pêk hatibû. Piştî lêgerîna leşkeran, konvoyê da ser riya xwe, gel li navenda Susurlukê li ber otogarê ji erebeyan peya bû û bi kortejeke dirêj ku dawîya wê xuya nedikir ber bi meydana "Şehîd İbrahim Çınar" qada mitîngê ve meşiya. Di pêşîya kortejê de dayikeke kurd ku fîstanê wê ji rengên kesk û sor û zer bû bi nîşana serfiraziyê li pêşîyê dimeşiya. Ew dayika pîr jî her du lingên xwe seqet bû, gopalekî ku ji bafonê çêkiribû di bin çengê wê de bû. Lê ligel pîrsgirêka nexweşiya xwe jî wekî qîzeke 16 salî bi çoş û heyecanê mezin tevî gel diruşme diavêtin. Ji awirên wê dayika kurd diyar dibû ku kezeba wê ji ber kirînen çeteyan şewitiye. Bi rastî dema ew dayika kurd di ber polîsan re derbas dibû, te digot qey bi-muşekan êrişî wan dike.

Balkêş e di wê navberê de ji niştêcihên navçeya Susurlukê tu kesî xuya nedikir. Yanî zarokêkî bi tenê jî derneketibû ber pacyê. Qet ew qîrîn û awaza sih û pênc hezar mirovî his nedikirin. Te digot qey ew navçe vala bûye. Diviyabû ku piştgiriyeke ne di hesabê de bihata kirin. Mixabin ji dêvla niştêcihên Susurlukê tîman û polîsan di pacyên malan de cihê xwe girtibûn. Wekî ku em filmekî dikşînin wan jî bi kamerayan em dikîşandin. Hi-

nekan ji wan tîm û polîsan jî wênekêşî jî dikirin. Wekî ku di her mitîngê de diqewime, dema firoke di ser serê me re difîrîn û dengê "yûh!" ji girseyê bilind dibû.

Berî destpêka mitîngê ji bo şehîdan deqîqeyek rawestîna rêzgirtinê pêk hat. Di wê navberê de jî wekî her tim diruşme û hwd. dihatin avêtin. Divê navberê de em ji bîr nekin, kurdên li qada mitîngê ji diruşmeyên ku ÖDP'yîyan diavêtin nexweş bûn. Heta ji hev re digotin "Ev çi mirovên reformîst in; ma qey diruşme neman bi dûvê "İnadına aşk inadına sosyalizm" girtine û pê bernadin. Piştî ku mitîngê des pê kir, hin pîrsgirêk di navbera HADEP û ÖDP'yê de derketin. Li dêvla ku kêşeyê bi şewazeke bêdeng çareser bikin, bi haporlorê xwestin kêşeyê çareser bikin. Ev yek bû sedema dîmenên nebaş. Bi rastî di wê navberê de gel jî şaş mabû. Geh li aliyê HADEP'ê geh jî li aliyê ÖDP'ê dînihêrt, hew mabû ku girse ji hev biqete. Wişa xuya dikir ÖDP'ê îcar jî wekî her car xwestibû xwe derxe pêş, ew helwest bûbû sedema zivêrbûna rayedarên HADEP'ê, lewre jî rûdaneke wiha nebaş pêk hatibû. Mixabin vê helwesta rayedarên ÖDP'ê piştî mitîngê jî dom kir, çalakiya hevpar hinekî jî bi alîkariya çapemeniya mihemedok, kirin malê xwe.

**Di mitîngê de kê çi got:**

**Serokê HADEP'ê Murat İnanlık:**

Em ne ji bo ku çeteyan û kujeran qehreman îlan bikin, ne jî ji bo ku dewê Susurlukê vexwin hatine vê derê. Em ji bo ku çeteyan jî biqefêlin jî nehatine vê derê. Ji bo ku li vê derê pê li dûvê çeteyan kirine, em-hatin. Her wiha ji bo ku em, ji vir bikevin pey çeteyan em hatine. Piştî ku me tîkiliya çeteyê li vê derê eşkere kir, emê herin Rihayê, Amedê, Batmanê, dosyayên Muhsîn Melik, Vedat Aydın û Mehmet Sincar ji refikan daxin. Piştî re emê veşerin Enqereyê, emê kesên ku navenda HEP'ê bombe kirine, kesên ku Uğur Mumcu û Faik Çandan kuştin derxînin holê.

**Serokê ÖDP'ê Refik Kardeş:**

Ev sîstem jî destpêkê û heya îro li ser talan û metîngeriye hatiye avakirin û ji bo berjewendiyên komek serdest, kar kiriye. Heta ku kêşeya kurd çareser nebe, aramî li Tirkîyeyê pêk nayê. Bi vî parlamentoyê pîrsgirêk çareser nabe. Pîrsgirêk wê bi yekitiya hêzen şoreşger û demokrat çareser bibe.

**Serokê İP'ê Aytemir Güller:**

Li ser vê cografyayê gelek Tirkîye hene, Tirkîyeke ku gundan dişewitîne tirkîyeke ku mirovan dikuje, tirkîyeke ku rewşenbîr û nivîskarên xwe diavêje girtîgehan... Lê divê neyê ji bîr kirin ku li Tirkîyeyê hêzen şoreşger û demokrat jî hene.

**Serokê EMEP'ê Kurt Tüzül:**

Dewlet bi çeteyan serbilind e, lê em bi Apê Mûsa, Metin Göktepe serbilind in. Dewletê heta niha ji bo eşkerekirina çeteyan tiştêk nekir, em ne bawer in ku ji îro pê ve jî tiştêkî bike, yê jî çeteyan hesab bipîrsin, gelê li vir e.

**Serokê ÖDP'ê Ufuk Uras:**

Emê bi ser bazirganên çekan û eroînîroşan de herin, yên ku dibêjin me ji bo dewletê ev kar kirin divê hesab bidin. Ji kengî ve şewitandina daristanan, tecavûzkirina jinan, kuştina mirovan, bazirganiya eroînê bûye welatparêzî. Ew kes kujer û qeşmêrên siyasetê ne. Em pêşeroja xwe naxin destê van kesên faşîst.

Piştî axaftinan hunermend Suavi û Leman Sam jî piştgiriya xwe bi stranên xwe diyar kirin.

AZAD ALTUN



# Helbestine bijartî



## Bihara Evînê

(Ji bo bîranîna hevalê  
Abbas Yokuş "Cano, Rûbar")

Ji axîna cergê xaka birîndar  
Cobar diherikin  
Ji xwîna xortên çeleng  
Qêrîna robarên dixuşin  
bi hêstirê dayikan  
Hawara zeriyan  
Bêjna rihanî berdidan ji latan  
Nalenala bûkên ciwan  
Û zik qelişî  
Çelmisîna jiyane  
Li rûyê tovên hêviyê  
Yên bi serê sûngiyan  
Kuşî  
Girîna zarokên  
Li ber dîwaran  
Sêwî û tazi  
Awirên pêşerojê  
Ji ber guran  
xwe avêtin agir  
Çav pişkiwîn  
  
Dicle di hinav hembêz kir  
Bi lorîkên bêdeng  
Dergûş hejand  
Ji êş û elemê mêjand  
bi hêrsa Feratê dizê  
Ji derd û kulên dîrokî  
Bû gurpegurpa dil  
Xwîn meşî li bedenê  
Bi sond silav dane jiyane

L. Amedê Keleha azadiyê  
Cano bi berxwedan dixwîne

Ew dilê bi kul û birîn  
Şûstî  
Bi agirê meşala Mazlûman  
Can avdayî  
Ji şewata hesreta çaran  
hêza jiyane stand  
Ji tîna rojiyê mirinê  
Bi şewqa tîrêjên Egîdan  
Tevî çîrûskên eşqa dilê stêrkan  
Stêr kir yar  
Hêvî kir bar  
Çiya kir war  
Û bi dilekî li ken  
Ber bi hêlîna evînê firîn

Li Koyê Spî  
Rêwiyê tolê  
Bi serbilindiya Cûdî  
Û heybeta azadiya Agirî  
Çav li ezman  
Dimeşe  
Roj û şev  
Havîn û zivistan  
Li evînê digere  
Li çiyayê Munzurê

## Rûbar e

Xwîna dil  
Dikele  
Pêl li ser hev wer dibin  
Bi hêz û lez  
Ser Newala Laçê diherike  
Mîna Zapê zelal  
Û bi kîn  
Derman dike  
Birîna axa pîroz  
Av dide  
Tovên hêviyê  
Dipişkiwîne  
Çavê gupikên evînê  
Hêz dide  
Bejna gulên şikestî  
Li ezmanê şîn  
Stêrk diçirîsîn  
  
Rû xêş û lêv bi ken dibe  
Ew bihara kuştî  
Pêl pêlî belav dibe  
Bêhna azadiyê  
Li gulistana evînê  
Di şevên biharê di bin şewqê  
stêrkan  
  
Li ber awaza cergê Rûbaran  
Silav didin hev  
Çavên zeriya û ciwanan  
Hevûdin radimûsin  
Dilê evîndaran  
Hembêz dikin hev  
Rihê dildaran

MEHMET MEHMEDÎ / BARTIN

## Mazî

Mazî...mazî  
Maziye bejn bilind  
Rêbendên li pêşberî min  
Bilindiya te  
Egerê nedîtina min e  
Bo tu deverên din  
Tenê Mêrdîna min  
Serê sibeha di hembêza te de  
Wek xifşeyek nazdar  
xuya dike  
Mazî...  
Û ez ji li vê deşta fireh û dirêj  
Kûr keserên xwe  
Bi dirêjahiya salan dikşînim  
Lê ez xewnevan im mazî  
Û dilê min li pişta te  
Evîndar e  
Li evîniyê mezin digere  
Ez başokeyekî bêhêlîn im  
mazî  
min divê  
Li ser kavilên BIRCA BELEK  
Dinim  
û çend helbestên Cizirî  
Ji çavên SELMA re  
Bixwînim  
Ji wir berê xwe bidim Bazîde  
û "Nûbihara Biçûkan"  
Ji gora XANÎ derînim...  
Mazî...  
Heta kengî  
wê zer-marên jehrîni  
viyana min bidizin  
û bûka serbixêlî  
ji keçkanî de bixînin?  
Dem hatîye mazî  
Ku ez li ser pişta "Demil  
qeran"\*  
Bend û sînora biqelêsim  
û xwe bi Sîpanê Xelatê

## Rêwî

Piştî  
pênc salên nefiyê  
rêwî me  
ber bi welat.  
Mîna mindalekî çar salî  
bêsebir  
û bêtebat im.  
  
Zû bajo ajoye  
min bigihîjîne  
cihê bav û kalan  
dîsa bikevim kuşateyn a  
Xalê Xelef  
nanê Xaltîka Xanê bixwim  
li ser tenûrê.  
Û dîsa bi hevalan re  
Birgê bileyizim  
li qada serhildanê.  
  
Bajo ajoye zû bajo!  
naxwazim bimirim  
çav vekirî.

bigihînim...

Reş-Konê felekê  
Li ser gola WANÊ  
ji hev veçirînim  
Hêsrên çavê XECÊ vemalim  
û tola Siyamend  
ji pezkoviyê keçel  
Hilînim...  
Da li welatê rojê  
rok hilê Mazî  
û kevokên spî  
li destên me dinin.

XEMGÎNÊ REMO

\*Demilqeran: navê hespê Siyamend e



## Çîrok

Hê di zarokatiya xwe de ji  
Rûken  
hişaza  
û pir jîr bû.  
  
Bav digot bila bibe parêzer  
da bê parastin  
mafên mirovan.  
Dê digot bila bibe bijîşk  
bê bibe derman  
ji xwedî nexweş û  
birîndaran re  
  
Bû bersiv  
ji bo her du daxwazan  
bo welat bibe azad  
mîrov bibin xwedî maf  
bibin şareza  
  
Xwe bi ava nemiriyan şûst  
çû ket nav refên  
Gerîla

BERKEN BERÊ



Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê


- 8.11.97 Şemî: Konsera Koma Gulên Xerzan. saet: 14  
Konsera Kardeş Türküler. Saet: 17.30
- 9.11.97 Yoksem: Konser: Dîwana Dengbêjan. saet: 14  
Konsera Koma Rojhilat, saet: 17.30



Li NÇM ya İzmirê

- 8.11.97 Şemî: Konsera Hozan Cezmî: Du hêstirên çavan im 'Çiyayê Agirî'
- 9.11.97 Yoksem: Şanoya Hêvî: Gurî, saet: 15.00-18.00
- 12.11.97 Çarşem: Konferans: DED. û Girîgeh (DGM ve Cezaevleri)-Amadekar: Akin Birdal, saet: 18.00

# Jiyan, dostanî û guman: 'Dûpişk'



**D**i sala 1982'de mirovek dikeve girtîgehê. Ev mirov Eşber Yağmurdereli ye. Gava dikeve Girtîgeha Sînopê, di hucreyê de dimîne. Notirvan dûpişkekî davêje nav hucreyê. Li ber vê serpêhatiyê Eşber Yağmurdereli bi navê "Akrep (dûpişk)" şanoyekê dinivise. Ev ji aliyê Şanoya Hunerê ya Enqereyê (AST) hatiye amadekirin û di roja 3-4'ê sermawêzê de li Kadiköyê Halk Eğitim Merkezi (Navenda Perwerdehiya Gel a Kadiköyê) derket pêşberî temaşevanan.

Derhêneriya wê Rutkay Aziz û muzîka wê ji Kemal Günüş kiriye. Lîstik ji aliyê dekorê ve gelekî sade bû, lîstikvan bi rola xwe serkeftî xuya dikirin. Bi taybetî kesê ku rola Eşber Yağmurdereli girtiye ser xwe (Lemi Bilgin), gelek baş rola xwe tîne cih, xuya bû makyajê baş lê hatibû kirin. Ji bo afirandina atmosfera Kela Sînopê jî dengê behrê hatibû bikaranîn. Berî ku lîstik dest pê bike ji kasetê mesa-ja Eşber Yağmurdereli, hate pêşkêşkirin. Vê yekê bandoreke mezin li temaşevanan kir.

Şano ji du perde û çarde sahnayan pêk dihat. Her sehneyeke wê li ser bûyer û rastiyekekî sekinîye.

Di perdeya yekemîn de sahnayêke tarî du zindan û du şewl tînin. Di hucreyekê de mirovekî kor, rihspî û kal, bêdeng rûniştiye. Temaşevan di bin bandora vê bêdengiyê de dimînin. Çûn û hatina notirvan wê bedengiyê xera dike. Notirvan di hatineke xwe de dûpişkekê diavêje hundirê hucreya wî mirovê kal û kor. Divê ew mirov êdî li cihekî ku firehiya

wê du gav in bi dûpişk re bijî! Ew êdî tim di nav şik û gumanê de ye. Kesekî ku pê re bi-peyve tune ye û her wiha kes tune ye ku namayên wî bixwîne.


Piştî demekê, girtiyekî adlî tînin ba wî. Di hucreyê her du mirov hevdu nabînin, lê çavên van lê ye ku bi pirsan hev nas bikin. Bi pirs û bersivan demek wilo dibihure. Mirovê girtiye adlî hêdî hêdî tê guhartin. Hevaltî û dostiyeke baş çêdibe di navbera her du mirovan de.

Di perda duyemîn de mahkûmê adlî diçe dadgehê. Gava vedigere ji hevalê xwe re tiştê ku dîtine dibêje: "Tu dibêjî qey yê derve derd û keder giş dane me û kêfxweşî giş ji xwe re hiştine. Ez rojekê ji vir derkevim jî, fedî dikim te li vir bihêlim û derkevim nav mirovan." Piştî re jî dibêje: "Dema ku ez li Girtîgeha Samsûnê bûm ji derve çekê ji min re anîn û gotin: 'Mirovê kor-bikuje, heta tu bêjî beş emê pera bidin te. Ku hewce be bike emê te bibin heta Almaniyayê jî.' Lê sirgûna te derket Trabzonê û çênêbû. Lê bi wê çekê mirovekî din hate kuştin."

Piştî re, mahkûmê adlî tê darvekirin. Hevalê wî yê siyasî bi kulma li dîwaran dixê û diqire: "Min ev mîrkujî dît. Min ji xwe fedî kir. Li welatê min bi milyon mirov di xewa miriyan de ne. Bi deh hezaran kes tînin kuştin, haya kesî ji wan nabe." Dûpişkan ew kela dagir kirine. Bijîşk dibêjin ji wan xirabî nayê. Bila bi mahkuman re bijîn. Dûpişk tu zararê nadin laşê me, lê belê jehra xwe berdidin nava me, rûmet û şexsiyeta me dilewitînin."

ŞEXMÛS SEFÊR

TÎŞK



## Piştêney asayiş

BEKIR BAHOZ

**M**awayek sal ziyatir e bas le hewlî Turkiye bo damezrandinê piştêneyekî asayiş dekrê. Mebestî rageyendirawî Turkiye lew hengawe pir le metirsiye, rêgirtine le gerîlakanî Partî Kîrêkaranî Kurdistan (PKK) bo ewey le başûrî Kurdistanewe, nexzêne bakurî Kurdistan û dest le hêzekanî supay Turkiye neweşênin. Belê eme mebest û amancî rageyendirawî Turkiye ye, belam aya be rastî amancî Turkiye be ewendewe dewestê? Bêguman na.

Carê ber le hemû şitê nakrê çawdêrî siyasî, hewlî damezrandinê piştêney asayiş, dîr le çîwarçewey peymanî nêwan Turkiye û Îsrail binirxêne. Diyarîş e ke ew peywendiyê stratîjîyê be çawdêrî Amerîka û le jêr say ew dewlete da, neşûnûma dekat û pere destênê. Helbete Amerîkaş berjewendî xoy dexate serûy hemû behayekîtir û her layên û dewletêk rû be rûy Amerîka betewe û hereşe le berjewendî ew welate bikat, dekwête ber xezebî Washington.

Rûn û aşkira ye ke bizûtnewey rizgarîxwazî neteweyetî Kurdistan, bizûtneweyekî resen û dij be berjewendî û nexşe û planekanî dewletekanî împeryalist e. Yan rastir, bo rastkirdinewey ew hele gewrane ye ke zilhêzekan le herêmek e encamiyan dawê. Ke wate dagîrkeranî Kurdistan û hawpeymananî ewan le amancî lawazkirdin yaxûd le nawbirdinî bizûtnewey kurd da yek degirnewe. Her boyeşe, Turkiye le ber çawî welatanî rojawawe, hemû yasa û rêskanî nêw dewletan dexate jêr pê û peyta peyta pelamarî başûrî Kurdistan dedat. Hemû carêkîş dewletî turk nexşe bû planî xoy sebarete be başûrî Kurdistan le jêr perdey pelamardanî gerîlakanî PKK da deşarêwatewe. Belam ewende hêrişî kird û ew karey bo neçîwe ser, êsta têdekoşê be yek berd çendîn çoleke bikujê, bo nimûne Turkiye hewl deda be damezrandinê piştêney asayiş xencerêkî kul le dilî bizûtnewey rizgarîxwazî neteweyetî Kurdistan bidat.

Metirsî le ewe de niye Turkiye çendê le rûberî xakî başûrî Kurdistan dagîr dekat û piştêney asayişî lê dademezrênê, belkû metirsî le ewe da ye ke gelo Turkiye çî core çekêk le herêmeke cêgir dekat û kam, çêşin teknolojiya be kar dêne, be wata hereşeke seray ewey bo ser gelî kurd û bizûtnewey rizgarîxwazî ew gele ye le heman kat da bo ser welatî herêmekeş e. Ke mijar hate ser em xale îtir amancî rasteqîney Turkiye le damezrandî piştêney asayiş rûn debêtewe; wata lawazkirdin û inca le nawbirdinî bizavî rizgarîxwazî kurd nek tenya le bakurî Kurdistan, belkû le hemû parçekanî Kurdistan û le serûy hemwanewe kujandinewey ew rûnakiye kizey le başûrî Kurdistan dagîrsawe û destgirtine be ser şerçawekanî petrol da, le şarekanî Kerkûk û Mûsil.

Helbet eger bigerînewe bo ser babetî peymanî serbazî û hawkarî berfirawanî nêwan Turkiye û Îsrail, ewa boman derdekwê ke amancêkî tîrî serekî le damezrandinê piştêney asayiş, hereşe kirdine le Îran, le Sûriye. Çûnke em du welate le herêmeke, mil bo siyaseta firawanxwazî Îsrail naden û dij be giftûgakanî aşî Rojhelatî Nawerast, radewestî. Le layekî tirewe bas le ewe dekrê ke Turkiye ezmûnî Îsrail le başûrî Lubnan degîwêzêtewê bo başûrî Kurdistan. Reng e em boçûne le rûy teoriyewe rast be, belam be kirdewe hergîz ser nagrê, çûnke ciyawazî zor heye le nêwan başûrî Lubnan û başûrî Kurdistan da. Ewey ke lere da dête gorê, ewe ye ke gele kurd hergîz natwanê tenêkî namo le cestay xoy da helbigirê, be wateyekî tir, kurd le tiwanayan da heye, xwarû û Kurdistan le hêzekanî supay Turkiye biken be dozexêkî hemîşe daxraw.



# Remo û Kevroşk

**D**iya wî zexm bi destê wî girtîbû û wekî ku kaş bike, ew bi xwe re dibir. Remo ji kerban digiriya û nedixwest here.

Serê sibê zû diya wî ew ji xew hişyar kiribû, kincên wî yê zivistanê lê kiribûn û hinek tişt ji bo xwarinê kiribûn tûrekî û ji mal derketibûn. Hemû gundî li hola gund kom bûbûn. Remo şaş mabû. Gelo çima gundî li vir kom bûbûn? Jin gişt bi kelgirî bûn, mêr bi hêrs û bi keder bûn. Li pêşiyê muxtar û hemû gundî bêdeng û bi xem ber bi çiya meşiyar. Gundiyar ceşîtî qebûl nekiribûn û biryara koçberbûnê dabûn. Remo hîn bêhtir xwe ji şûn ve dişikand û nedixwest here. Diya Remo bi dengê lava li ber lawê xwe rûnişt û got:

– Bavê diya xwe, ez bi qurbana dil û cegera te bim. Ma em neçin leşkerê tirko yê bênamûs, wê me jî tevî gund bişewitînin.

Remo dîsa jî nedixwest here, digot lê kûçikê min, lê kevroşka min, lê...

Ji heşt zarokên wan tenê Remo li cem wan mabû. Remo wekî ronîya çavên wan bû, nedixwestin ku tu kederê bibîne. Li ber giriyê wî, dilê diya Remo tebat nedikir û bi dilşewafî got:

– Ronahiya çavên dayika xwe! Ez bi qurban! Ma em çi bikin? Şeva din heval hatin, gotin ji gund derkevin, heke na wê tirko we jî tevî gund bişewitîne.

Remo hinek sekinî û got:

– Na, na hîn çend roj berê hevalan ji min re gotin: “Tu êdî mezin î, li gundiyan xwedî derkeve û alîkariyê bide diya xwe.” Ez bi we re nayem, ez ji tirko natirsim. Ez nebim wê kî li kevroşka min mêze bike!

– Berxa diya xwe rast e, lê tirko har û dîn bûye û ji kerban dixwaze koka kurdan biqelîne.

Remo fêhm kir ku ew neçin wê leşker wan tevî gund û mal û heywanan bikuje. Demekê bêdeng ma. Hîn heftiya berê bi timên taybet gundê li biniya gundê wan dabûn ber topan û dû re jî şewitandibûn. Sê gundî di hundirê malê de di nava êgir de çan dabûn. Bi deh caran hatibûn gundê wan û her carê hemû gundî li xopana gund kom kiribûn û mêr û jin tazî û rût kiribûn û bi dar û jopan li wan dabûn. Remo dît ku diya wî nahêle ew here bang li kûçikê xwe bike û kevroşka xwe bine, ji nişka ve destê xwe ji nav destê diya xwe kişand û ber bi gund ve bazda. Zilfo dît ku Remo ber bi gund direve wê jî da dû û bang lê kir:

– Remo tu bi ku ve diçî berxê min! Were gundî çûn, em pir li paş man, wê leşkerê tirko me bigirin û bikujin.

Lingê Remo li kevirê ket û li erdê ket, diya wî dît ku ew ket, hîn bi leztir revî û gavek wê wek sed gavan bû, gihîşt û ew ji erdê rakir û hembêz kir.

– Berxê min cihekî te êşiya? Tu çima wiha dikî û min diqeherîni? Ma ez dixwazim war û cihê xwe bêhêlim û biçim? Zarokatiya min, ciwantiya min li vî gundî derbas bû. Min li vî gundî jî bavê te hez kir û sê bira û du xwişkên te û tu min li vî gundî anîn rûyê dinyayê. Kezaba min dihele ku ez cih û warê xwe li cih di-hêlim û diçim.

Zilfo wekî bi miroveki mezin re diaxi-ve bi Remo re dipeyivî. Remo diya xwe hembêz kir û got:

– Dayê çi dibe em Qopo jî bi xwe re bin, gu-



neh e, leşkerê tirko wê bibînin ewê wî bikujin.

Zilfo dît ku kurê wê bêyî kevroşkê nayê, got:

– Dayik bi qurban be, zû bike here kevroşka xwe bigire û em bi lez biçin, bigihêjin gundiyan.

Remo bi lez çû nav darên biniya gund û deriyê holika kevroşkê vekir, dît ku ew jî hişyar e.

– Qopo te zanibû, gundî îro gund dihe-  
lin, diçin.

Kevroşk bêdeng li hembêza wî xwe bi cih kir. Remo sekinî û bi wî re axivî.

– Tu dizanî leşkerê tirko wê gundê me îro bişewitînin. Çima?

Ji dêla kevroşkê re bi xwe ji xwe dipir-sî û bersiva xwe jî bi xwe dida.

– Çima, ji ber ku em alîkariya hevalan

dikin, ma em alîkariya wan nekin emê ji bibin ceşş. Ceşşîti pir pîs e, li bajaran kes silava mirovan nagire, bavê kê ceşş be, zarok bi wan re nalîzin û heval jî qet ji ceşşan hez nakin.

Remo xwe ji bîr kiribû, di cihê xwe de sekinibû û bi kevroşkê re diaxivî. Diya wî dît ku ew sekiniye bang kir:

– Berxê min lez bike lez bike, wa dengê tankan tê û em pir li paş gundiyan man.

Remo bi dengê diya xwe wekî ji xew hişyar be û bi rev çû cem dayika xwe û bi lez bi rê ketin. Zilfo bi qasê mêrek jîr bû. Remo tevî kevroşka xwe ew hilda pişt a xwe û bi lez xwe gihand gundiyan. Cihê ku ew herin pir qiyamet bû û bi bayekî pir sar ji aliyê bakurê ve dihat ku mirov ji ber ve bayê sar diricifî. Hîn riyaya saetê hebû ku xwe bigihêjin cem hevalan. Remo dît ku diya wî westiyaye û bêhna xwe bi zor dide û digir e,

gundî ditîbûn, ew didan ber guleyan. Hemûyan zarokên xwe yê biçûk girtin pişt a xwe û bi lez xwe gihandin nav daristanê. Gund di nava agir de dişewitî. Remo dema dît gundê wan dişewite, li diya xwe zivirî û got:

– Dayê xwezîka niha çeka min hebûya.

– Dayik bi qurban te yê çi bikira?

– Tu nabîni tirko gundê me dişewitîne, minê bi wan re şer bikira.

– Mêrxasê dayika xwe, kesek ji tirko natirse, lê em bêçek in, ew bi tank û topan tene ser me.

Her diçû qiyamet zêde dibû, kal û zarok bi zor dimeşiyar. Timên taybet gund dabûn ber agir û bi dûv gundiyan ketibûn. Kalê Oso ku heştê salî bû, pir westiyabû, nikaribû gav biavêje. Lingê wî li darekê ket û deverû li erdê dirêj bû. Beriya her kesî Remo reviya bi destê kalo girt û xwest wî ji erdê rake. Kalo pir kêfxweş bû ku Remo hatiye alîkariya wî dike.

– Kalo bi heyran, kurê min êdî bûye mêr, mêr.

– Kalo tu zanî dema em digihêjin hevalan, ez çek hildigirim û dibim gerîla.

– Bavê kalikê xwe tu hîn ne pir biçûk î?

Remo xwe wekî dikan tox kir û wekî mirovên mezin.

– Na kalo binêre ez çiqas mezin bûme.

Ez bibim gerîla şer bikim ku em careke din bizivirin welatê xwe. Remo û kalikê wî hem dimeşiyar û hem jî daxivîn. Ji nişka ve dengê guleyan hat, lê belê ev ne wekî dengê çekên neyar bûn. Ev deng hema ji biniya wan ji nav daristan dihat. Remo guhê xwe vît kir dengê gulan û li topan guhdar kir. Bi kêfê mezin got:

– Kalo ev dengê hevalan e!

– Kurê min tu çi zanî?

Ez dengê wan nas dikim, ew in, bawer bike ew in.

Got û ber bi wî dengî ve bi rev çû. Dît ku gerîla jî ber bi wî tî, di cihê xwe de sekinî. Bi dilxweşî kenîya û xêrhatin da wan û ji cih ve zivirî çû cem gundiyan. Remo pir kêfxweş bû, çû ji diya xwe û hemû gundiyan re got: Dilê Remo bi qasî perperikekê sivik û kêfxweş bibû. Birçibûna xwe û cemidandina xwe ji bîr kiribû. Xeyala çeka ku bidinê wî dikir û li aliyekî jî digot: “Gelo bavê min niha di çî rawêş de ye?” Êdî xwe wek gerîlayekî dît û li gerîlayan mêze dikir, wan çawa hereket bikira, wî jî bi wî awayî hereket dikir. Lê hîn, dev ji kevroşka xwe ber-nedida.

ROTÎNDA YETKÎNER



# Gazî û dilînên bindestan

**G**aziya min, navê pirtûka Berhîm Paşa ye. Ev pirtûk ji nav weşanên Nûbiharê wekî pirtûkeke helbestan derketiye.

Helbestvan Berhîm Paşa (Fahri Erdinc) ev pirtûk, digel mamosteyê xwe Ahmet Özbek, diyarî Osman Sebrî jî kiriye. Heta mirov bala xwe nede jînenîgariya helbestvan, mirov di sedema rastîn a vê diyarkirinê nagihêje; helbestvan bi xwe jî hembajariyê Osman Sebrî ye ango ji Kolika Semsûrê ye. Jixwe dema mirov bi baldarî li zimanê helbestan jî dinihêre, ev yek derdikeve holê.

Her çiqas helbestvan xwestiye xwe ji zimanê herêmkî rizgar bike jî bi temamî di vî warî de bi ser neketiye. Di helbestan de hinek qalib û şayesên herêmkî hatine bikaranîn. Vê yekê rengêkî gelêrî daye helbestan, xwendina wan hêsan û zimanê wan herikbar kiriye. Helbestên di pirtûkê de ji aliyê teşeyê ve bi awayekî serbest hatine nivîsîn, lê ahen-ga di nava rêzan de, rengêkî taybet dide helbestan. Di wêneyên di nava helbestan de bi biwêjên gelêrî û gotinên herêmkî hatine xêzkirin.

Divê bê gotin ku hinek çewtiyên rêzimanî ku xweserî gelê vê herême ne jî, di nava pirtûkê de cih girtine. Mînakê ji vê yekê re cînavka "xwe" ye. Gelê me yê ji vê herême di cihê kesê seyemîn yê yekjimar (wî/wê) de jî "xwe" bi kar tînin. Bo nimûne di helbesta "Ku dilgeşî bimire" de "Serê xwe pir mejxûl e" î gotin.

Di helbestan de mirôvhezî û welatparêzî bi awayekî zelal xwe dide der. Helbestvan cihê xwe li nîk, karker, palevan, şivan û bindestan digirê. Ev helwest hê di helbesta yekemîn de diyar dibe:

*di destekî min de pênuş  
di ê din de wêneyê pepûkan*



*di mêjiyê min de dilîne bindestan  
helbestvan im ez*

Helbestvan evîna xwe ya ji bo welêt bi van goti-

nan dide der:

*ey hêvidara azadiyê  
ey dayika mêrxas û gernasana  
eşqa te ez tenê naxwînim  
bi dilkulî û evîndarî*

Helbestvan li nîk bindestan cih digire, lê xwe ji rexnekirina wan jî nade alî. Rêzên li xwarê digel pêwistiya têkoşîn û hêviya ji bo azadiya welêt, rexneyên li bindestan jî xweş diyar dikin.

*li pêş kîjan xweşiyê nexweşî nîn e  
li pêş kîjan azadiyê dilî nîn e  
li pêş kîjan serdestiyê bindestî nîn e  
di bingeha kîjan bindestiyê de  
tirsonêkî û zexelî nîn e  
di bingeha kîjan azadiyê de  
xwîna şehîdan nîn e*

Di nav helbestên li ser gelek mijarên neteweyî û mirovî de, helbesta li ser rojhilat jî balkêş e:

*dayik e rojhilat  
ji tavê re  
dapîrk e rojhilat  
ji tavê re  
dûcan e rojhilat  
ji azadiyê re*

Ev pirtûka ji 64 rûpelan pêk hatiye, tê de 33 helbest cih digirin.

Navnîşan:

Nûbihar Yayınları

Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.

Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3 Fatih/İstanbul

SAMÎ BERBANG

## Birjuwaziya me

JAN DOST



**H**efteya borî ez di telefonê de bi Hadî El-Elewî re peyivîm. Ew nivîskarekî Iraqî yî mezin e. Demekê berê jî di rojnameya me de hevpeyvîna bi wî re hate weşandin. Axaftina me li ser çapkirina kitêban bû. Bêhtir jî li ser çapkirina Mem û Zînê bû. Wî soz daye min ku çapeke nû ji Mem û Zînê re pêk bîne. Min jî bo vê yekê doz li partiyeke kurd kiribû lê wê partiye mesele di guh re nekiribû. Vî camêrê ereb, dostê miletê kurd gof: "Ma tu nikarî ji birjuwaziya kurdan re bibêjî, belkî xwe bidin ber çapa kitêbê." Min jê re got: "birjuwaziya me ya welatparêz, hay ji çandê nîn e, ew wekî rêxistinên me yên siyasî, çand û kitêban beredayî dibînin."

Wî bersiya min da û got: "Rast e,

birjuwaziya rojhilatî ne bi terzeke asayî ava bûye, ji roja roj de, ew peyrewê, ango girêdayî mêtîngerên derve ye. Navê vê birjuwaziyê jî, birjuwaziya kolonyalîst e, û ev celeb birjuwazî li herêma rojhilat tev de tê dîtin. Ev qat naşibe birjuwaziya ewrûpî, ya ku civaka ewrûpî di her warî de pêş xist û bi taybetî di warê çand û huner û zanistiyê de." Bi rastî jî wilo ye. birjuwaziya me kurdan, gaveke tenê civak bi pêş nexistiye. Û hîn jî ya ereb û tirkan jî xirabtir e. Eger birjuwaziya ereb yan a tirk girêdayî Rojava be, ya me hîn bêhtir li paş e û girêdayî birjuwaziya ereb û tirk e. Ew tu carê armancên civaka kurdî, tirkî nafikirin. Hedefa wê pereyan pir bike û bi çi hawî be jî nafikire. Ango nûjenkirina civakê, pêşxistina aboriyê, rizgarkirina welêt ne di bala wan de ye. Heta niha zengînekî kurd, rojekê pozê wî neşewitiye û alîkarî bi saziyeke çandî re nekiriye. Belkî di nav re yek çend qirûş pêşkêş kiribin, lê ew nayê hesêb, ya ku em dixwazin pêk were, birjuwaziya me li projeyên çandî xwedî derkeve, medyayeyê çêke, têxe destê xwe, xwerû bi kurdî

be û têkoşîna neteweyî bike armanca xwe ya sereke, ji birjuwaziya derve veqete.

Lê mixabîn, ev hemû xewn û xeyal in û tu hêvî ji vê birjuwaziyê nemaye. Ez hinekên birjuwa li Bajarê Amûdê nas dikim, hemû pereyên xwe li kexaneyên Şamê wînda dikin, lê yek qurûşî ji bo çalakiyeke çandî nadin. Azadiya Welat, rojnameya me ya têkoşer a ku di şertên dijwar de li ber xwe dide û bi zor xwe diqedîne, ez vê yekê ji dîrokê re dibêjim û bi hêvî me piştî vî barî û niha jî zimân dirêj nebin, kes fortan nede. Tu kes ji maldarên kurd xwe nade ber vê rojnameyê. Zengînen ku rojnameyê ji destên min digirin, bêfêdî buhayê wê dolarekî didin. Êdî tu dolarekî bidî destê parsekekî jî ji destê te nagire, sonda wan li min tune, min rojname bêpere jî da yekî, nadigirt. Ez tu carî rûyê birjuwaziya kurdî spî nakim, ew yekê rûş e, bêxîret e û dûvikê birjuwaziya kolonyal e. Bînin bîra xwe, Mîr Celadet ji bo berdewamkirina kovara Hawar xalî û palasên xwe firotin û di binê bîrekê de mir.



# Ava Cihokê

# Kade kilor û binsêl

**D**u heval di ber gundekî re derbas dibin. Lê mêze di-kin ku li pêş gund di zewiyekê de silq û tivir çandine. Ji ber ku wê bèn dîtin nikarin berhev bikin. Her du heval bi hev dişewirin û biryar didin ku li nav gund govendê bigirin, kîlaman bistirên. Yek ji yê din re dibêje: "Jixwe kurd ji govendê pir hez dikin. Gund hemû wê li dor me bicivîn. Dema ku govend şên bû, tu here ji silq û tiviran, çiqas dikarî berhev bike û li ber wî girê sor li hêviya min bisekine."

Bi kêliyekê şûn de, her du heval bi destê hev digirin û bi dengeke berz kilaman li hev vedigerînin. Hêdî hêdî govend şên dibe. Dû re gundî jî dest bi kilaman dikin. Hevalek ji govendê vediqete diçe nav zewiyê, lê belê erd pir hişk e û silq û tivir jê dernakevin. Ji bêgavî vedigere nav govendê û bi kilamkî ji hevalê xwe re dibêje:

Kuro kero ker kîşî  
Li govendê xwe dimiştî  
Min dikir nedikir nedikiştî.



Hevalê din rewşê fêhm dike û bi kilamkî li hevalê xwe vedigerîne:  
Kuro kero ker ker e  
Ne min got cihok (cêw) li hember e.  
Tu cihok berdê serê  
Ewê bi xwe xwe bidê der e.

Hevalê wî fêhm dike. Disa ji govendê vediqete, diçe ava cihokê ber dide ser zewiyê û bi hêsani zadên xwe berhev dike. Demekê şûn de hevalê din jî tê û bi kêf riya xwe berdewam dikin.

MUSTAFA BORAK

**D**u heval bi rê de diçin, pir westiyane û pir jî birçî bûne. Riya wan li êlekê dikeve. Dema di nav êlê re derbas dibin, bi taybetî diçin konê ku li ber derî kilor û binsêl dipijin. Hevalek ji kebaniya malê re dibêjin:

- Em rêwî ne û pir birçî ne. Tu dikarî gepek nan bidî me?

- Kerem bikin, ser seran û ser çavan, dibêje xwe-diyê malê û diçe jî wan re hinek nan û mast tîne. Her du heval pir hêrs dibin, ji ber ku jinikê ji wan re kade û kilor neanîne. Bi hev dişewirin û ji nişke ve di-jûnî(cêr) hev didin.

Kebaniya malê û çiran dikevin navbera wan. Yek kêrê dikişîne ewê din direve, xwe davêje kulfnê. Binsêl, kilor û kadeyan hildigre, lê dinêre ku pir mezin in nakevin berikê, bi sixêf ji hevalê xwe re dibêje:

- Min di gora bavê te yî ne eşirî nevesêrî gawo. Hevalê din mesaja wî digire, dizane ku nikare kade, kilor û binsêlan veşêre. Vêca ew rê nişanî hevalê xwe dide:

- Lawo ez di gora bavê te bigêm. Kerî kerî, pirtî pirtî, paşil pêşilo.

Vêca ewê di kulfnê de fahm dike, kêra xwe derdixe, kilor û kadeyan kerî kerî, pirtî pirtî dike û paşilên xwe tijî dike dû re diqîre:

- Eman bextê we de me, wî bemedin heya min xwe xilas kir dû re...

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (93) XAÇEPIRSA

K	Ş	B	S	Ş	Ş	Ş	Ş	Ş	Ş
G	U	L	E	R	O	T	A	Ç	D
L	A	V	A	J	T	A	K	Ü	
E	T	J	N	Q	E	R	A	X	
A	N	A	T	M	T	N	A		
I	R	O	K	K	N	T	N		
I	S	E	R	A	D				
A	K	A	M	A	R	I			
A	X	A	Q	I	L				
A	R	A	M	I	K				

PEYVA VEŞARÎ → DAMEZIRTIN

**Bersiva Xaçepirsa 91'ê**

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 93'an Kaseta Koma Rojhilat "Mezrabotan im ez" e

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsîn û tevî navîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 91'ê pirtûka Mahmut Ahnak "Şironun Ateşî" qezenc kirine: İdris Bedirhan/Amed, Halil Yüksel/İzmir, Ali Temel/Mersin, Cemil Cem Stenbol, Fasih Çaruş/İzmir

Guhartin Nivîskarê Ey Reqîb (wêne)	Stirî Nazîk	Ajansa İnanê Şekir	Navekî mîran	Tipeke kurdi Rîzgar bû	5	Qertafek
2			3		Azot Serhişkî	
Herêmeke Rihayê Terkkîrîn			Lê şidiyan Dengdarên nebe			Pê...
Bajarekî Kurdistanê Eş			Tipa duyemîn Xana nûjen	7	Ronahtiya rojê Sanceq	
		Xor Pere		Bi soranî çav		4
Bajarekî Tirkîyeyê	Ê dîn Rojek		6			
1				Ajansa tirkan		
Veqetande kek Gihaneke k			Kur Tipeke kurdi			
	Cinavkeke îşarkî		Lê genim tê hêrandîn			

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7



**Qîmê**



## ÇIMDARÎNÊ SUSURLUK:

# Berzî berzî Susurluk de jî, bî berzî



Zek yeno zanayin hîrê menga sermawez serçarnayinê qezayê Susurluk o, û qandê serçarnayin, HA-DEP, SİP, EMEP, ÖDP, DBP, İHD û komê demokratanê bînan piya Susurluk de mîtingî virast. Ma jî qandê nê mîtingî şewa jûwê meng, Stenbol ra kewtîm ray û şim Susurluk.

Mi bi xo verî jî, çend finî na rayde raywanî kerdîbî. La belê na raywanî, ê verînan ra zaf zaf zewbîbî. Çimke na raywanî deyrî vatena, govend antena û dirûşmey çekerdina, ravêrd. Û kesî vatê qayê keso şino veyve. Keftê winaynîniya raya Susurluk 9-10 seat ramit, la belê kesî vatê qayê jû seat ramit.

Mabendê saet 8 û 9 de, verî SIP, pey ra ÖDP û peyra jî HADEP, badê çend deqana jî erabwa HADEP deyra, "Berzî berzî" resê Susurluk û cawo ke kamyon vardiyêbi Mercedes, deyra "Berzî berzî" wi ja açarna cayê veyvî û hemû kes na deyra tepşiya govend.

Şaro ke, şarîstananê bînan ra amebi Susurluk, înan jû kişt ra govend antê, jû kişt ra dirûşmey çekerdê (eyştê) û çetey lanet kerdê, şarê Susurluk jî govend û deyrê

kurdanê ke, televîzyonan de dibî, ê deyrî goşandê xo ya eşnay û govendî jî çiman dê xo ya dî. Heveyî şarê Susurluk jî, mabendê deyran û govendanê kurdan miyan de hewndê xo ra weriştî û tarso ke, verdê çend rojan, tîmanê taybetiyên dabi ci û vatbi, "Rojo bazar terorîstê bêrê, Susurluk talan kirê", ê tarsî ra xelsiyaybî û kiştê bînan ra jî zûrê tîmanê taybetiyan û çeteyê rastî vejîyaybî werte.

Seat, jû de nezdiyê hîris hezarî şêlik arêbiyabi pêser û pêriknan jew fek ra nê dirûşmey çekardî: "Bijî biratiya şaran", "Çeteyê hesab bidê şarî", "Enqere enqere çetan menimne", "Çeteyê tevera, roşnikarê zere de". Heveyê xortanê kurdan jî wina dirûşmey çekerdê: "Bijî Serok Apo", "Pirode gerîla pirode Kurdistanî ronî". Bado serokê partiyan û komanê demokratan qîsey kerdî, qîsanê serokan peyra hurnemend, Suavi û Leman Sam konser da û mîting qedîna û şarî rehatîna karê xo yê demokratikî ca ardina û dirûşmana bî vilay û her kes hetê şarîstanê xo ya deyran û dirûşmana û heman kêfa kewtî ray.

MEMED DREWŞ / STENBOL

## Amed jî çetey protesto kerdî

Serçarnayenê qezeyê Susurlukî de sebê (qandê) protestokerdenê çeteyê dewlet, şarê Amedî şanê 3'yê meng, seat newde mûsnayin (gösteri) virast.

Roja hirêyê aşma sermawêzî de saet dewrê newê şanî de çatrayê taxa Ofisî de zey meşk ra do war bo, şilî varayê, labelê fina jî, nezdiyê-di hezar kesî amey pêser û dewleta çetî protesto kerdî.

Şêlik çar hetan ra têdir taviştinê (pavistina) mûmana, ebi çepikan, tilîlî û ebi dirûşman dekewtî meydanê Ofisî. Xora verûcûy zî polîsî pêhesiyeybî û serê kuçan qefelney (tepiştî) bî. La belê, şêlik zî bi qerarbî û her şinê zêde bine..

Mûsnayinî pancês deqey ramit. Sloganê zey "Bêveng nebê, go dor bêro şima"; "Çetey meclis de, Beşikçi û mebusê DEP'ê zerede", "Bimro faşizm" û "Bijî biratiya şaran" amey eşten. Şêlik, gam gam zêdeyayê û gamna polîsî jî zêdeyay û copana, çiwana vardayin virast. Badê ku şêlik ver bi hetê taxê Rezan'wa dest bi reyashiyan kerd û sloganê, "Wa qehr bê çetey" eştî, xo ver vila bî.

Ger mardim rewşê Amede rind bizano, mardim fam keno, eno mûsneye. Çiqas herciyaye wo. Şarê Amede bi dozê xo wa girêdaye wo. Hendê qetlîam û terorê dewleta estê, la belê, şarê Amede fina jî teslîm nêbeno. Amed de xoverdayin û serhewadayin, dewam keno.

ROŞAN LEZGÎN / AMED

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınclık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN YÖYLER

Gerinendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Têkiliyên  
bi Gel re  
(Halkla İlişkiler  
Müdürü)  
METİN AKSOY

Berpîrsê Saziye  
(Müessese Müdürü)  
TAHIR ELDİMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NAVNİŞAN  
Ayhan Işık Sk.  
No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

**Munchen:**  
(Nünerê Giştî yê  
Ewrûpayê)  
Mahmut Gergerli  
49 871 67 08 84

**Brüksel:**  
Meden Ferho  
32 532 721 12 03

**Suriye:**  
Jana Seyda  
Helim Yüsv  
**Berlin:**  
Silêman Sîdo  
00 49 30 691 6495

**Hannover:**  
Selim Biçûk  
49 572 18 13 60

**Stockholm:**  
Robîn Rewşen  
46 87 51 05 64

**Bonn:**  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

**Hollanda:**  
S. A. Fewzî  
31 104 85 55 43



Hevala Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya, Helbestvan Yurda Kaya:

# Bi hezaran Rozayên me hene



Yurda Kaya

**H**evala Serokê Parlamentoya Kurdistanê Li Derveyî Welat (PKDW) Yaşar Kaya, Yurda Kaya der barê jiyana malbata xwe û birêz Yaşar Kaya, Apê Mûsa û Beşikçi Xoce, şoreşa kurd, jinên kurd û edebiyatê de pirsên hevalê me SALIHÊ KEVIRBIRÎ bersivandin.

**Hûn dikarin ji xwendevanên me re malbata xwe bidin nasîn?**

■ Ez di 21'ê kewçêra 1945'an de, li gundê Alacayê (Kizilkule) ku girêdahiye Dîgora Qersê ye hatime dinyayê. Li herêma em ji eşira "Kaskan" ji mala "Torinê" tene naskirin. Kalikê min "Teyo Beg" ji hêla leşkerên romî ve bi heft guleyan hatiye kuştin. Mamê min İsmail Hakkı Alaca, mirovekî xwende û ebûqat bû. Ji partiya S.Demirel parlamentêre Qersê bû. Bavê min Mustafa Alaca gelek nexwend, bi kar û barê çandiniyê re eleqedar bû, lê ez baş dame xwendin. Ji kurdariyê gelekî hez dikir. Di sala 1967'an de İsmail Beşikçi anibû mala me.

**Ez ne şaş bim birêz Yaşar Kaya ji, ji malbateke eşîr û aristokrat dihat, we çawa hev nas kir?**

■ Belê rast e! ew jî, ji malbateke eşîr e. Ji Diyadîna Agiriyê, ji eşira "Qehremana" ye. Dema birayê min Evdîrehman li Zanîngeha Stenbolê di beşa hiqûqê dixwend, ew û Yaşar hev nas dikin. Ji ber ku Yaşar ji "Doza 49'an" dihatê darizandin, bavê min jî gelek jê hez dikir. Wêneyê min ditiye, pir ecibandiyê.

**Ji ber ku Yaşar Kaya kar û barê PKDW'ê li Ewrûpayê dimeşîne, hûn**

**Ji erdê hetanî asîmana pêşveçûn hene. Şer didome, lê kurd di her qadên jiyana de bi pêş ketine. Gelê kurd ê bi namûs ji bo serkeftinê dixebite. Êdî kurdê berê miriye. Kurdê nû çêbûye.**

**gelek caran diçin Ewrûpayê û tén. Gelo jiyana kurdan li wê derê di rewşeke çawa de ye?**

■ Li Ewrûpayê kurdên baş hene. Lê mixabin malbatên kurd li ser zarokên xwe bê bandor in. Zarok nivî kurd, nivî jî ewrûpî ne. Lê tesîra partyê li ewrûpayê gelekî heye. Disa jî ez xwezahî, av û axa Kurdistanê rengîn bi tevahiya katedral û şatoyên Ewrûpayê nadim. Televîzyon heye, radyo, rojname û kovar hene; bi taybetî MED-TV jî bô me nirxê mezîn e, çande me bi riya MED-TV'yê dikeve mala me. Kurdistan tu car jî ber çavên kurdên li Ewrûpayê naçe. Mirov çiqas ji welat dûr be hew qas ji hesret zêde dibe.

**Tê gotin ku li piştî her zilamekî xurt, jinek heye. Ge-**

**lo hûn di warê siyaseta û diplomasiyê de çiqas alîkarê Birêz Kaya ne?**

■ Ev 27 sal e ku em zewicîne, ji wê rojê heta îro ez pê re me. Piştî ku HEP hate girtin, jê re gotin: "Bibe serokê DEP'ê", hat ji min pirsî. Min got: "Ew peywireke pîroz e, hilgire, tuyê bi ser bikevî." Di sala 1967'an de li leşkeriyê Üstegmen bû, lê ji ber kurdariyê wî (Doza 49'an) "pirpir"ên wî jê kirin. Êdî navê wî li leşkeriyê bû "Şakıncalı piyade". Leşkeriya xwe li Trakyayê wekî çawîş qedand. Ez gelek salan di navbera dadgeh û girtîgehê de çûm û hatim.

**Birêz Yaşar Kaya li mal çawa ye?**

■ Pir baş e, pir dilovan e. Ji paqijiyê pir hez dike. Xwediyê dîsîplîneke xurt e. Mirovekî gelek fêhmdar e.

**Di ketin û derketina Tirkiyeyê de tu astengî derketine pêşiya we?**

■ Di sala 1995'an de, dema cara yekemîn min xwest ku ez derkevim der-

ve, gelek astengî derxistin. Wîze (Almanya) nedidan min. Pasaporta min jî di wê navberê de dizîn. Rojê li Beşiktaşê li "Qesra Çiraxanê" panelek li ser "Kêşeya kurd" hebû. Claudia Roth beşdar dibû. Leza wê hebû, gote min: "Here balyozxaneyê, min ji wan re gotiye, lê heger disa wîze û pasaport nedine te, ezê bêm çekim." Lê dema ez çûm dane min. Niha ez bi rehetî diçim û tîm...

**Hûn 10 sal berê û îro bidin ber hev, gelo hûnê bigihêjin enameke çawa?**

■ Ji erdê bigire hetanî asîmana pêşveçûn hene. Şer didome, lê kurd

xaneyê Kurdistanê" bû. Ji ber ku jî hêlên Kurdistanê û ji Ewrûpayê kê dihat Stenbolê, dibû mêvanê Apê Mûsa. Ez dixwazim bîranîneke xwe der heqê Musa Anter, Beşikçi, Celîlê Celîl, Ordixanê Celîl û İsmet Şerîf Wanlî de binim zimên: Roja ku Enstîtûya Kurdî vebibû ew giş li mala me civiyabûn, me ew vexwedibûn xwarinê. İsmet Şerîf Wanlî rabû û got: "Yaşar pîreka te tîrke, gelek xwarinên xweş amade kirine?", Min got: "Na, ez kurd im!" Wê çaxê Celîlê Celîl got: "Hûn ji ku derê ne." min got: "Em ji Dîgorê gundê Alaca (Kizilkule) ye ne." Wî jî got: "Em jî ji Kizilkuleyê çûne Sovyetê", Ordixan û Celîlê Celîl rabûn ji Yaşar re gotin: "Tu zavayê me yî."

**Em dizanin ku navbera we û edebiyata kurdî baş e. Hûn helbestan jî dinivîsin, hûn dikarin behsa wê yekê bikin?**

■ Heta niha li ser Kurdistan, Helebçe, jinên kurd, şervanên kurd; 70 jî wan kurdî, 190 helbest min nivîsandine. Qetîama Helebçeyê û serjêkirina serê gerilayan ku di

rojnameya "The European" de derketibûn gelek bandor li ser min hiştin. Gelek caran nivîsên min bi navê "Rozerîn Kaya" di rojnameya "Welat" de hatin weşandin.

**Mesaja we bi giştî ji bo gelê kurd bi taybetî jî ji bo jinên kurd heye gelo?**

■ Ji bo gelê kurd ez dibêjim bila yekitiya xwe xurt bikin. Ji ber ku fersendekê mezîn îro ketiye destê gelê me. Divê jinên kurd azad û wekhev bijî. Jina kurd îro di nav gerîla de xwe îspat kiriye. Jin pêwîst e di warê perwerde û azadiya aboriyê de xwedî însiyatîf be. Mîna Roza Lûksembûrg...

**Gelo Roza Lûksembûrgên me hene?**

■ Bêguman... Zilan, Leyla, Qasim, Margiret Semîre, Bêrîtan, Ronahî, Raşan, Zekiye Alkan û hwd. bi hezaran Roza Lûksembûrgên kurd hene.

